

KAMRAN BEDIR-XAN


DERSÊN DIYANETÊ

Û

HEDÎSÊN CENABÎ PÊXEMBER

PARIS

1971



Kamran Bedir - Xan

Dersên Serîetê

û

Hedîsên Cenabî Pêxember



Paris

I 9 7 I

Nvîsîlarên, bi zmanên, biyanî li ser Kurdistanê

Le Kurdistan ou la mort . (bi zmanê frensizî).

René Mauries .239 , rûpel . Robert Laffont .

Les Kurdes " révolution silencieuse . (bi zmanê

fransizî . Jean Pradier . 286 rûpel . Ducros Éditeur .

Bordeau .

Les Kurdes et le Droit . (bi zmanê frensizî).

L; Rambout . 160 , rûpel . Les Editions du cerf .

Les Kurdes . (bi zmanê frensizî) .

Basile Nikitine .360 rûpel . Librairie C. Klincksieck .

Journey Among Brave Men .

Dana Adams Schmidt . (bi zmanê ingilîzî).

298 , rûpel . Little , Brown and Comp. Boston .

Kurdistan and the Kurds . (bi zmanê ingilîzî).

Abdul Rahman Ghassenlou . 304 , rûpel . Prague .

Kurdistan , (bi zmanê elemanî) .

M. Zikmund - J.Hanzelka . 62 , rûpel . Praha .

Vertraue der Franke . (bi zmanê elemanî) .

K. Dettman . 115 , rûpel . Hamburg . Matari Verlag .

Land in Aufstand Kurdistan . (bi zmanê elemanî).

Erlendur Haraldsson . 225, rûpel . Matari Verlag .

Hamburg .

Med Uppreisnar mō nnum í Kurdista; . (bi zmanê izlendî .

Erlendur Haraldsson . 182 , rûpel . Skuggsjá .

Stier om Eufrat - i kurdernas land .

Barbro Karabuda . (bi zmanê svêçî) .

100 , rûpel .Tidens Förlag , Stockholm .

Der Adler von Kurdistan K.Bedir-Khan.Voggenreiter Verlag.

Bi navê Xudayê pak ê dilo van û mihrivan .

Dersên Şerîetê .

Ji Xwedê mezintir tu kes nî ne .

Riknên Baweriyê .

Riknên baweriyê şeş in : Baweriya bi Xwedê , bi ferîşte yên wî , bi pêxemberên wî , bi kitêbên wî , bi roja paşiyê û bi qeda û qederê .

Baweriya bi Xwedê .

Baweriya bi Xwedê ev e ko tu bawer bikî : Xwedê heye , qedîm e ango her hebû , baqî ye angî her heye , çûna wî nî ne , ne weke tu tiştî ye , bi nefsa xwe qaim e , ango bi xwe ye , yek e , xwey qudret e , xwey irade ye , zana ye , sax e , dibihîse , dibîne , daxêve .

Riknên islamê .

Riknên islamê pênc in : Kelîma şehadetê , nmêj , rojî , zekat û hec .

Mana kelîma şehadetê : baweriya bi yekîtiya Xwedê û baweriya bi pêxemberîtiya Hezretê Mihemed e .

(Misilman ji dil bawer dikin û bi zmanê xwe

dibêjin : Ez bawer dikim ko Xwedê yek e û

bê hevrî û heval e . Ez bawer dikim ko

Hezretê Mihemed pêxember e û qasidê emr û fermanên

Xwedê ye . Ez dizanim û bawer dikim ko

pêxemberê paşîn cenabê Mihemed e û tu pêxember piştî wî ranabe .

Nmêj , rojî , Zekat û hec

Nmêj ji Xwedê re ibdet e , rojî girtina nefsê ji tiştên xwarinê ye , zekat dana pişkekê ji malî ye û hec qesda bal Mala Xwedê ve ye .

Mikelif

Mikeliff ew mirov e ko aqi l û baxix e û dîn seh kiriye .
Ferz û wacib .

Ferz ew emrê Xwedê ye ko pêkanîna wî li ser mikelifan wacib e ,
ango bi vê ne vê ye , wek nmêj û rojî . Bi kirina ferzê , mirov
digehe xêrê û bi nekirina wê ezêb dibîne .

Ferza eyn û kifaye .

Ferza eyin ew emr û fermana Xwedê ye ko divê
her mikelif wê pêk bîne ; wek nmêj û rojî .
Ferza kifaye ew emrê Xwedê ye ko kengê hin wê
dikin ji ser hinan radibe wek : nmêja miriyan

Sinet .

Sinet ew emr e ko bikirina wê mirov xwey xêr dibe û bi nekiri
na wê lome jê tê kirin .

Heram .

Heram ew tişt e ko divê mirov ne ke . Nekirina wê xeyr e û
kirina wê ezab e .

Mekrûh .

Mekrûh ew tişt e ko mirov ne ke spehî ye .
Mibah

Mibah ew tişt e ko helal e wek vexwarina avê û xwari
na zadî .

Destmêja mezin û piçûk .

Rakirina destmêja mezin bi niyet û bi şuştina difn û devî û te
mamê laşî pêk tê .
Destmêja kiçik bi niyet û bi şuştina temamê rû û her du des-
tan heta enişkan , destdana serî û bi şuştina her du peyan heta
gozekan pêk tê .

Destmêja mezin bi çi çêdibe .

Destmêja mezin piştî gihandina jin û mêrân bi derketina havênî bi mirinê , gava jin dikevin cilan , nifas û zayînê çêdibe .
Wê gavê rakirina wê ferz e .
Destmêja kiçik bi çi çêdibe .

Bi derketina tiştêkî ji her du reyan , bi xewê , bi destdana jina biyanî bê perde , bi destdana aletan , bi dînitî , bi serxweşî , bi vereşana ji devî , bi şika destmêjê û bi kenê ji dil . Nmêj , bê pêkanîna wan her du destmêjan , ne dirist e .
Nmêjên Ferz .

Di bîst û çar saetan de , ser mikelifan , pênc nmêj ferz in :
Nmêja nîvrovê , êvarê , mixribê , îşayê û sibehê .
Wextên nmêjan :
Wextê nmêja nîvrovê , ji xwîlbûna rojê bal rojavayî ve heta siha tiştan dibe du caran .
Wextê nmêja êvarê , ji wî wextî heta rojavayê ye .
Wextê nmêja mexribê , ji avabûna rojê heta windabûna sorayîya rojê ye .
Wextê nmêja îşayê , ji wî wextî heta sehriya sibehê ye .
Wextê nmêja sibehê ji wî wextî heta derketina rojê ye .
Riketên nmêjên ferz .

Di bîst û çar saetan de hevde riket nmêj ferz e : Çar riket di nîvrovê de , çar di êvarê de , sisê der mexribê , çar di îşayê de û dido si sibehê de .
Riketên nmêjên sinet :

Riketên nmêjên sinet bîst û dido ne :
Du riket berî nmêja sibehê , çar riket berî ya nîvrovê û çar piştî wê ; çar berî nmêja êvarê û du riket piştî wê , du riket berî mexribê û du riket piştî wê , du riket berî nmêja îşayê û du riket piştî wê .
Riknên nmêjê .

Riknên nmêjê dwanzde ne :

Niyet , tekbîra teherunê , rawestana ji peya , xwendina fati
hê , rukû , rabûn , du secde , ruîştina di nav bira her
duwan de , rawestana di hemiyan de , rûniştina jibo tehiyata
pasî û kelîna şehadetê digel selewata li ser Hezretê Pêxember
selava pêşî , tertîba di nav wan de digel peyhevî .
Tertîb û peyhevî .

Her wekî hatiye gotin , di nmêjê de , divê her riknê wê bi
cîh bên .

Şertên diristiya nmêjê .

Şertên diristiya nmêjê heşet in :

Misilmanî , temyîz ango hiş , paqîjiya cilan û cendekî û
cîhê nmêjê , veşartina ewretê , ango navbira nêavikê û
her du ejnûyan , ji bona mêran û veşartina timamê cendekî
ji bo jinan ji bilî rû û her du kefen destan , hatina wextî ,
berê xwe dan qiblê , ne gohartina niyetê , gotina bi
qesd .

Betalkirina nmêjê :

Nmêj bi derdana riknekî ji riknên xwe an bi derdana şertekî
ji şertên xwe betal dibe .

Nmêja îne .

Nmêja bi civatî ferza kifayetê ye , lê kirina
îne bi civatî ferza eyn e . Nmêja îne du rîket in .

Nmêja civatî .

Şertên Nmêja civatî çar in :

Nmêjkerdivê niyeta civatîyê li pey îmamî bîne herwekî : min
niyet e ez nmêja nivroyê çar rîket , bi civat û tebayî
îman ji Xwedê re bikin ; divê bi nmêja îmamî zana be , ne
keve pêş îmamî , nîzîkî îmamî bibe heke ne nizgeft e û
di nav bira wan de tu perde ne be .

Nmêja her du cejnan .

Du cejn hene : a kiçik û a mezin .
A kiçik ya remezanê ye , a mezin ya heciya ye . Nmêja
cejnê sinetek e , sineteke domkirî ango tu car ne hatiye der-
dan , divê em jî her bikin . Her nmêja cjnê du rîket in .
Nmêja miriyan .

Kengê misilmanek dimire şuştin , kifin kirin , nmêj kirin û
veşartina wî an wê ferza kifayetê ye . Nmêja miriyan , ji
peya ve , tête kirin .

Zekat .

Zekat dana tiştêkî ji malî ye û li ser misilmanan
ferz e û zekat jiwan tiştên jêrîn tê derêxistin û dayîn :
Deve , çêlek , pez , zêr û zîv , çandî û meywe , tîştên
kirîn û firotinê ko karê salê jê çêbûye û sal bi ser de
wegeriya ye .

1 - Ko ba yekî pênc deve ango hêştir hene zekata wan pezek e .
Heta bîst û çar devehan , ji ber pênc deve ve , pezek
tê derêxistin .

2 - Zekata çêlekan , ji sihî despê dike , ji ber sih
çêlekê ve golikeke yeksalî tê derêxistin . Ji her çilî
conegayek tê dayîn .

3 - Zekata pez ji çilî desotpêike . Jiber çil pezê spî ve
bilindîrek û ji berçil pezê reş ve tiştîrek tê derêxistin ,
ji ber sed û bîst û yekî ve du pez û ji ber du sed û yekî
ve sê pez tî derêxistin . Ji ber çar sed pezî ve çar û
paşê pêş her sedî ve pezek tê derêxistin .

4 - Zekata zêrî ji bîst misqalan destpê dike . Zekata zîvî
ji du sed dirheman destpê dike . Qaida wê ji her çilî

yek e angoji bîst misqalan nîv misqal û ji du sed dirheman
pênc dirhem tî derêxistin .

Zekata zad û meywe

Zekata zad û meywan , ji pênc bar destpê dike . Qaida wan ji her dehanûpê ve yek e . Heke ew bê dişwarî çêbûne . Ko ew bizehmet çêbûne , di her bîstan de yek e .

6 - Ji tiştên kirîn û firotinê di her çilî de yek e .

Zekata fitrê .

Divê her misilmanê mikelif pêş xwe ve û pêş her çi kesê ko nifaqeyê wî li ser wî ye divê , di şev an roja cejnê de , zekata fitrê bide . Zekata fitrê , ji bona her nefsekî , çar kulm zad in , ji belengazan re tê dayîn .

Rojî .

Rojî , di rojên remezanê de , bi niyeta rojiyê , girtina nefsa ye . Mirov divê nefsa xwe , ji xwarin û vexwarinê , ji nîzîkbûna jinan , biparêze .

Meha remezanê . . .

Rojî , di meha remezanê de , li ser hemî misilmanên mikelif , ferz e . Bi dîtina heyvê an bi timambûna heyva Şabanê sih roj tê girtin .

Niyeta rojiyê .

Ji girtina rojiyê re , her ro , niyet lazim e . niyeta wê ev e :

Min îşev niyet e sibe rojî bigirim , pêş edakirina ferza remezana salê ve , ji Xwedê re .

Wextê rojiyê :

Ji ewilê spêdê heta rojavayê divê mirov (jin û mêr) nefsa xwe bigire .

Şkêrandina rojiyê .

Rojî bi verçandina ji qesd , bi gihandina tiştên bal zikî ve , ji kulên vekirî , wek dev , difn , guh , bi zivirîna ji isla-mîtiyê , bi dîtina xwînê û xwîna piştî zayîna zarokî , bigihan-

dina jin û mêran , bi derêxistina havê nî ji qesd tê şkênandin .

Hec .

Hec , qesda bal Mala Xwedê ve ye , ji bona pêkanîna ferza Xwedê .Hec ser hemî misilmanên mikelîf ferz e heke ew maldar e û dikare here hecê . Heca ferz di jiyînê de çarekê ye .
Riknên hecê .

Riknên hecê pênc in : Ihrama digel niyetê , rawestana Erefê , heft gerên dora Beytê , çûn û hatina di nav bera Sefa û Merwê de , kurkirin .
Omre .

Omre jî wek hecê ferz e , digel şert û riknên xwe ji bilî rawestana li Erefê .
Tiştên ko di hecê de wacib in :

Ihrama ji mîqatê , avêtina cilên durûyî di Ihramê de , avêtina sê keviran , nivistina li Muzdelifeyê , nivistina li Minayê ji boşev û rojên teşrîkê , tewafa widaê , parastina ji heramên Ihramê .
Heramên Ihramê deh in :

Wergirtina tiştên durûyê û her çi tiştê ko weke wan be ;
Ji bona mêran nuxumandina serî , ji bona jinan nuxumandina rû û her du kefên destan ;
duhundana mûyên serî ;
kurkirina mûyan ;
qusandina neynûkan ;
bihn xweş kirin ;
kuştina nêçîrên xwarinê yên bejî ;
jin mehr kirin , kutan û têkilbûna bi şewet .

+++ HEDISEN CENABE PEKEMBER +++
+++

"Rehmet û Silava Xwedê Lê Be"

- 1) Ji bona her derî mifteyek heye , mifta bihustê ew e ko mirov ji piçûk û belengazan hez bike û li halê wan bipirse .
- 2) Heçî malê miletî bêrê dixwin para wan dojah e .
- 3) Bawermend divê bi şûr û gotina xwe cihadê bikin û piştta zilm û neheqiyê , derewker û zaliman bişkînin .
- 4) Xwedê qenc e , ji qencyê hez dike ; pak e , hejî paqijan dike ; comerd e , ji comerdan hez dike .
- 5) Di roja piştawiyê de , piraniya xelkê , ji ber gotinên bêrê û beredayî wê bêne êşandin .
- 6) Dev û dranên xwe her paqij bigirin .
- 7) Piştî îmanê tiştê çak ew e ko xelk ji hev û du hez bikin .
- 8) Hon brayên hev in , arîkariya hev û du bikin , rastiye bêjine hev û li hev xedarî û bêbextiyê me kin .
- 9) Yê ko baweriya xwe bi Xwedê û bi axiretê aniye an qencyê dibêje , an devê xwe digire .
- 10) Ji gulçîçekên pengava û ji jinên spehî û bêesil xwe biparêze .
- 11) Ma ji çavtengiyê girantir nexweşî heye ?
- 12) Gotin carina sihrek e û şîir carina hikmetek e .
- 13) Gava hon dest bi karekî dikin devê xwe bigirin , xelk ji mirovên ko îşê wan li rê ye dibeicin .

- 14) Ji nifirên bêşûçan bitirsîn , navbeyna wan û Xwedê da tu perde nî ne .
- 15) Ne bixweziya lê bi xebat û kirinê jiyîna xwe biborîne .
- 16) Lokê girêde û piştîre bispêre Xwedê ,
- 17) Ko qiyamet rabû û di destê te de şîtilek hebe û kêş pê ket divê tu wî şîtilî bişîtilîni û ji destê xwe bernedî .
- 18) Gava yekî ji we enirî divê ne peyive .
- 19) Yê ko timakar e ; belengaz e .
- 20) Yê ko zekâtê dide û mêvana dihevine û arîkariya mirovên ko ketine tengasiyê dike ne çavteng e .
- 21) Heke hon bi malê xwe ni karin arîkariya xelkê bikin bi gotinên şêrîn qedrê wan bigirin .
- 22) Dînê islamê qaim e , ibadeta xwe nerm , nerm bike û zo - rê li nefsa xwe me de , me be mîna mirovê ko bar û serbarê heywanê xwe giran dike , piştî heywanê wî qul dibe li çol û şevderê dimîne , û na gihe hevalê xwe .
- 23) Dîn tîştêkî hêsanî ye , kes ni kare zora diyanetê bibe , dîn zora her kesî dibe , ne pir bikin , ne hindik bikin , bi can û bôn bikin .
- 24) Kirîna qencyê şabûniya dil e , û xirabî di canê mirovan de birînek e û ew na xwazin ko kes pê bihese .
- 25) Qencyê ji dê û bavê xwe re bikin da ko zaroyên we jî qencyê ji we re bikin .
- 26) Xatirê xelkê bigirin , dilê xelkê me şkinînin .
- 27) Dev ji xirabiyê berdan sedeqe ye .
- 28) Nefspiçûk bin ta ko kes li kesî mezinahiyê ne ke .
- 29) Emanetê bidîne xwediyê wî , heke kesî bêbextî li te kir tu bêbextiyê lê me ke .
- 30) Rizqê xwe ji xebata xwe bixwazin .
- 31) Rizqê xwe ji axê bixwazin .
- 32) Rizqê xwe ji keda cotê xwe bixwazin .
- 33) Yê ko derdê xwe vedîşêre sewabeke mezin digehê .
- 34) Heke tu şerm na kî her tîştî bike .

- 35) Dêv ji hevalên ne çak berde , an ne xelk wê bizanin tu kî yî .
- 36) Îşê ko tê de poşmanî heye me ke , ko te kir poşman me be û efiwa xwe me xwaze .
- 37) Hevelekî qenc ji xwe re bibijêre , û xwe jê biparêze .
- 38) Diyariya bidine hev hezkirina we bêtir dibe .
- 39) Tobe gunehan radike .
- 40) Tevdîr nivê îş û debara we ye .
- 41) Herwekî mirov bi nefsa xwe re rast û qenc e , divê bi xelkê re jî rast û qenc bibe , ji bona li hev hatina mirovan bixebite û xêrxwazê xelkê be û di feqîriya xwe de jî li halê belengazan binêre ; bi pêkanîna wan sê tiştan îman timam dibe .
- 42) Berê cîranekî baş û dawî xanîkî qenc peyda bike .
- 43) Berê li cîranekî baş bigere û pişt wî re li xanîkî qenc bigere .
- 44) Yê ko dibe sebeba qencî an xirabiyekê heçko wî ew kirine .
- 45) Yê ko rastiyê na bêje û derewa dike û ne xwediyê gotinê xwe ye û ji omanetê re xayinitiyê dike , ew nimêja xwe bike , zekata xwe bide û here Hec û Emrê jî , dîsa minafiq e .
- 46) Spehîtiya mirovan xweşiya zmanê wan e .
- 47) Bihuşt di bin lingê daya de ye .
- 48) Şer tep û hîle ye .
- 49) Mirov kêmaniya tiştêkî ko jê hez dike ne dibîne û ne jî dibihîse .
- 50) Zanîn mîna tiştêkî ye ko misilman heçko wînda kiriye , ko peyda dike dibe .
- 51) Yê ko baweriya xwe bi Xwedê aniye û misilman bûye , divê Xwediyê gotina xwe bibe û bêbextiyê ne ke .
- 52) Fedîkirin ji baweriyê ye . Hoya ji îmanê ye . Şerm - kirin , dîn hemî ev e .



- 53) Xwe ragirtin ew e ko mirov bi yekî hêja bişêwire û bê-
gotiniya wî ne ke .
- 54) Di nav mirovan de yê baştir ew e ko ji jin û zaroyên
xwe re baş e .
- 55) Mirovê xirab her îşî xira dike ; ber wekî sihik tama
hingivî xira dike .
- 56) Xelk hemî lêzên Xwedê ne , Xuda ji her kesî bêtir ji wî
mirovî hez dike yê ko bikêrî wan tê .
- 57) Di nav xaniyên misilmanan de xaniyê çêtir ew e ko tê de
sêwiyek hebe û qedrê wî bête girtin .
- 58) Dîn pend û şîret e .
- 59) Devji kirina tiştê ko ji qencî û rastiya wî ne ewle yî
berde û dest bi kirina tiştêkî bike ko tu xweş dizanî ew
qenc û rast e .
- 60) Xwediyê heqdivê baje ; guh bidin ê ! .
- 61) Ji dergûşê heta mirinê minêkarî zanîne bibin .
- 62) Zanîn di welatê Çîn û Maçînê de be jî lawekarê wê bibin.
- 63) Li ser jin û mêran ilm û zanîn ferz e .
- 64) Jin û mêr divê minêkarî zanîne bibin , ev omrê Xuda ye.
- 65) Qedrê rastiye bigirin , yê ko wê rastiye got piçûk be ,
mezin be , xurt be , belengaz be , ne tu xem e . (Rastî
ne ji dewlemendan bitenê re ye .)
- 66) Ne gunch tê ji bîr kirin , ne jî qencî winda dibe û
Xwedê jî na mire , tu bi kêfa xwe yî , herwekî dexwazî
bike .
- 67) Dev ji riyakaran berdîn ; ew bi kêr na yin .
- 68) Berê heval piştê re .
- 69) Şîr xulq diguhêre .
- 70) Ji Xwedê bitirsîn ; serê hikmetê ev e .
- 71) Heçiyê zmanê xwe digirin heye ko Xwedê li wan bê rehmê.
- 72) Yên ko bi xelkê re dilovan in ; Xwedê jî bi wan re di -
lovan e .
- 73) Rast biwezîne û hinkî bila zêde be , ta ko kêr ne be.

- 74) Yê ko bala xwe dide xelkê û ji tistên xerab ko ew dikin xwe diparêze , serdest dibe .
- 75) Sermiyânê miletekî ew e ko xulamîtiya wî dike .
- 76) Mirovên xirabtir ew in ko qedrê xelkê ji tirsê xwe digirin û dixwazin pê ji xirabîya wan ewle bibin .
- 77) Mirovên xirabtir ew in ko eqilmend nîzîkî civata wan na bin .
- 78) Dermanê nezaniyê pirs û xebat e .
- 79) Serekê xirabtir ew e ko bêrehm e .
- 80) Di nav xaniyên misilmanan de , xaniyê xirabtir ew e ko tê de sêwîyek heye û têtê êşandin .
- 81) Di nav misilmanan de mirovê xirabtir ew e ko têkilî xelkê na be , ji xwe razî ye û di emelê xwe de riyakar e .
- 82) Kirina qenciye mirovan ji xirabîyê diparêze .
- 83) Dan û qencî erma Xwedê disekinîne .
- 84) Bi hejkirin û arîkariya lêzimên xwe mirov emrê xwe digirê dike .
- 85) Ne xebardan hêja ye ; lê yên ko wê seh dikin kêmtir in .
- 86) Pê zerer jî bigehe te ; rastiye bibêje .
- 87) Di derba pêşîn de divê mirov sebrê bide xwe .
- 88) Mêvanî sê roj in ko dirêjtir bû , bû sedeqe .
- 89) Timakarî hikmet û zanîne ji dilê zanayan direvine .
- 90) Paqîjiya dil û laş nivê baweriyê ye .
- 91) Yê ko bi derewînî şêdetiyê dide mîna mişrikek e .
- 92) Wad mîna danê ye ; ko te wad kir bide .
- 93) Zilma xedara di roja piştawiyê de ji wan re dibe mij û dûman , pêşîya xwe na bînin .
- 94) Hikmê derewîn ê giran ew e ko li ser gumanekê hatiye dan .
- 95) Zilma dewlemendan a mezin ew e ko deynê xwe na din .
- 96) Wad deyn e .
- 97) Yê ko hîn dike û yê ko hîn dibe di qenciye de şîrî - kê hev in .
- 98) Tistên qenc û bikêrhatî ko hon dizanin . ji xelkê re

bêjin, îşê wan sivik bikin ; giran me kin .

- 99) Çavên xwe ber siûd û dewlemendiya xelkê me din .
- 100) Qenaştkar her serfiraz e û timakar her bê qedr e .
- 101) Tiştê ko na be tu lê binêrî ; lê me meyizîne .
- 102) Kîn û hesed qencyê radikin herwekî agir êzingan dişe -
witîne .
- 103) Rastiyê bêje , bila tehl be .
- 104) Mirov bi efiwkirna qisûran bilindtir û bi nefspiçûkahiye
mezintir dibe û mal tu cara ji sedeqan kêr na be .
- 105) Bêbext , bi nîşanekî , di roja piştawiyê de wê bêne
nas kirin .
- 106) Xwedê ji du sixletanhez dike : eqilmendî û xwe ragirtin.
- 107) Qazî sê texlît in , dido ji wan wê bikevin dogehê û yek
wê here bihuştê . Yê ko zana ye û di hikmê de adil bû wê
here bihuştê .
- Yê ko bi nezaniya xwe hikmekî ne rast daye , wê bikeve
dogehê .
- Û yê siseya ko zana ye lê bi qesd hikmekî ne rast daye
wê here cehenemê .
- 108) Ji gunehkariyê re ew bes e ; tiştê ko dikeve guhê te û tu
dibihîsî , dibêjî .
- 109) Eqilmendî xwe şidand û tiştên pêk anîn ko xelk û Xwedê
jê razî bûn .
- 110) Mirovê qels li gora eqelê xwe meşiya û her tişt bi dest
Xwedê re berda .
- 111) Bi belengaziyê mirov kafir jî dibin .
- 112) Bêbextiya mezintir ew e ko tu derewa li hevalê xwe dikî
û ew bawer dike ko tu rastiyê jê re dibêjî .
- 113) Her tiştê ko serxweşiyê çêdike şerab e , û her vexwarina
ko mirov pê serxweş dibe haram e .
- 114) Hon hemî şivan in û her şivanekî ji kerîfê xwe berpir --
siyar e .
- 115) Herwekî dikî bi te dikin .

- 116) Her qencî sedeqeyek e .
- 117) Her kes li gora cewherê xwe tê afirandin ko zmanê wî geriya xulqê wî xuya dibe .
- 118) Hêjabûna emelê her kesî li gora niyeta wî ye .
- 119) Heke tu bi yekî ji xwe aqiltir şewirî fîşê te tu cara xira na be .
- 120) Dilê xwe me bijînin mal û dewleta xelkê .
- 121) Mirovê ko cîranê wî jê ne ewle ye, ne bawermend e .
- 122) Kes ji kesî ne çêtir e ; lê çêtirbûn bi dîn û emel e .
- 123) Gava hakim , di nav beyna du peyayan de hikim dike , na be ko enirî be .
- 124) Îmana we timam na be heta ko hon herwekî ji nefsa xwe hez dikin ji bra û destbrayê xwe jî hez bikin .
- 125) Bawermendê pak du cara destê xwe dirêjî kula mîr na ke .
- 126) Çavtengiyê ji kesî re me ke ta ko xelk çavtengiyê ji te re ne ke , li gora taqeta xwe arîkariya xelkê bike .
- 127) Ne nefsa xwe ne jî xelkê biêşîne .
- 128) Qisûra xelkê me de rûyê wan ta ko xelk qisûra te ne dîn rûyê te .
- 129) Civat bi ewleyiyê çêdibe .
- 130) Mirovê ko şewir pê têne kirin divê ewle be , gotinan ne bêje .
- 131) Heke karê we paş ve çû , navê we pêş ve na çê .
- 132) Tiştê ko dilê te de heye û tu lê bi şik bûyî dev jê berde .
- 133) Ez mizgîniya bihuştê didim wî mirovê ko bi doxîn û zmanê xwe dikare .
- 134) Ez mizgîniya bihuştê didim wî mirovê ko karî bi zman û doxîna xwe .
- 135) Heçî ji zanînê hez dikin her birçî ne .
- 136) Misilmanên baş dev ji tiştên ko elaqe wan pê nî ne berdidin .
- 137) Yê ko heramiyê dike baweriya xwe bi Quranê ne aniye .

- 133) Bi xelkê re mi tra û idare kirin sedeqe ye .
- 139) Qelbê hêrî xwe bigirin û arîkariya wan bikin ,
bila qenciya we bigehe wan .
- 140) Di debara malê de tevdir û idare nîşana zanabûnê ye .
- 141) Yê ko hejî Xwedê dike ji kirina xirabiyê şermisar dibe.
- 142) Yê ko deynekî dike û dixwaze wî bide ; Xwedê jê re pêk
tîne .
- 143) Gava qencyekê dikî bi awakî delal bike .
- 144) Yê ko li ber Xwedê nefspiçûk e ; Xwedê wî mezin dike .
- 145) Yê ko bi kubarî bi rê ve diçe ; Xwedê lê na neyire .
- 146) Yê ko nîzikî guneha dibe heye ko bike .
- 147) Heke tu li beytikokî bêî rehmê ; Xwedê li te tê rehmê .
- 148) Yê ko namûsa heval û brayê xwe diparêze , Xwedê jî na -
mûsa wî diparêze .
- 149) Yê ko devê xwe digire digihe selametê .
- 150) Yê ko hîlekariyê dike ne ji min e .
- 151) Misilman ew e ko xelk ji bext û zmanê wî ewlê ne .
- 152) Yê ko baweriya xwe bi Xwedê û bi roja piştawiyê aniye;
cînarê xwe na êşîne û aciz na ke .
- 153) Yê ko baweriya xwe bi yezdan û bi axiretê aniye qedrê
mêvanê xwe digire .
- 154) Yê ko hespê xwe diêşîne ta ko ji siwaran derkeve ; ne
ji min e .
- 155) Mirovê ko tobe bike , weke ko guneh ne kiriye .
- 156) Heke hevalê te nefsa xwe ji tiştê ko tu pê ne qail î
bêrî dike ; rast be ne rast be înaniya xwe pê bine .
- 157) Binivin , lê ko hon hişyar bûn dest bi gotin û kirina
qencyê bikin .
- 158) Saxbûn û tiralî bi hev re bikêr na çên .
- 159) Yê ko mirovên di xwe bi xwedî dike weke sedeqe daye .
- 160) Yê ko poşman dibe , dibe tobedarê Xudayê xwe .
- 161) Xelkê heja du texlît in yên ko hîn dikin û yên ko hîn
dibin , êrîşê bê kêr in .

- 162) Jin mîna xwehên mirovan ne , divê qedrê wan bê girtin .
- 163) Mirov mîna madena ne ; hîn kêmayar in û hîn jî giran - biha ne .
- 164) Kovan û keser mirov digehînin nivê pîrîtiyê .
- 165) Yê ko devê xwe na girin her belayê dibînin .
- 166) Her arîkariya belengaz û biçareyan bikin , Xwedê wê arîkariya we bike .
- 167) Yê ko ji taqeta xwe bêtir ibadetê dîkin nefsa xwe dibin helakê .
- 168) Tenayî ji civata xirab qenctir e ; û civata qenc ji tenayiyê çêtir e .
- 169) Wey li wî mîletê ko zanayên wan , şêx û axayên wan xirab û bêkêr in .
- 170) Sunda me xwin ; an hon ê poşman bibin an derewker der - kevin .
- 171) Heçî xedar û nefsmezin in ; roja piştawiyê de wê bibin mîna mûriya û xelk wê pê li wan bikin .
- 172) Xwedê hejî wî mirovî dike yê ko gava tiştêkî dike qenc û rast dike .
- 173) Gava hon dibînin ko mirovek xirabiyê dike ; an bi destê xwe an bi zmanê xwe wî jê bidin paş , heke hon pê ni karin dia bikin ko ew dev ji wî îşê xerab berde .
- 174) Heke hon zalimekî bibînin û destê wî na girin û bardidin ko ew zilmîyê bike Xwedê we hemiyar diêşîne .
- 175) Cihada mezintir ew e ko mirov ji hakimekî zalim re rastiya bibêje .
- 176) Bav deriyê bihuştê ê navîn e , ko te qedrê bavê xwe girt , ew derî ji te re vedibe , ko te qedrê wî ne girt ew derî li ber te wê bê girtin .
- 177) Ko Xwedê keçîkek da we ; wê qenc bi xwedî bikin ; ew sibe nav beyna we û agirê dojahê de dibe bedenek .
- 178) Yê ko du keçan bi xwedî û mezin dike di roja piştawiyê de , bi min re dimeşe .

- 179) Yê ko keça xwe na êşîne û bernade ko brayê wê , wê bi-
êşîne dikeve bihuştê .
- 180) Ez û mirovê ko îşê sêwiyekî digêrîne di bihuştê de em
hevalên hev in .
- 181) Yê ko rêwiyekî bibîne û xwarina wî bide yê bêşik dikeve
bihuştê , meger ko wî gunehê kiriyê ko na yê efiw kirin.
- 182) Tu qenciyê kê me bîne , dev li ken bûn jî qencyek e .
- 183) Tacir di roja piştawiyê de bi fesadker û awanan re ye,
meger ko ew jî Xwedê tirsîyar bû , qencî kir û di dan û
standina xwe de rast bû .
- 184) Ko yekî qencî bi te kir , divê tu jî qencyê pê biki ,
heke ji destê te na yê , pesnê wî bide , heke tu qenciya
wî na bêjî û vedîşêrî kafir î .
- 185) Çavê ko ji tîrsa Xwedê giriya ye û çavê ko misilmanan
ji xirbiyê parastine agirê dogehê li wan çavan na keve .
- 186) Pêxember li neviyê xwe nêrî û got : Ji bo yê ko em ê
malê xwe ji we re bihêlin , em xwe desteng dîkin ; ji bo
yê ko em ê bikarin we bi xwedî bikin , em ber xwe dikevin
û tîrsonêk dibin ; û heke yekî drêjî we kir ji bona pa -
rastina we em çavsor dibin ; hon ji rûh û bihna Xwedê ne.
- 187) Gava Xwedê qenciya hakimekî dixwaze mirovekî qenc jê re
dike wezîr , heke hakim pêkanîna qencieke jî bîra kir we-
zîrê wî tîne bîra wî , ko hakim dest bi qencyekê kir ,
wezîr arîkariya wî dike , lê heke Xwedê serfiraziya ha -
kimekî na xwaze ; mirovekî xirab dike wezîrê wî , ko ha-
kim kirina qencyekê jî bîr kir wezîr wê na yêne bîra wî
û heke hakim dest bi kirina qencyekê dike wezîr na be
arîkarê wî .
- 188) Mîna mirovan dixwim û vedixwim û weke wan radibim û
rûdinim ; ez jî mirovek im û nefsmeziniyê na kim .
- 189) Nîşanê minafîqan sisê ne , gava dipeyivin derewa dîkin,
gava wada xwe didin lê diqulipin , ko mirov piştî xwe da
yê bebextiyê lê dîkin .
- 190) Ko hon hatine vexwendin , herin .

- 191) Ji malê xwe berê nefsa xwe bi xwedî bike , paşê arî -
kariya mirovên di xwe û di pişt re arî cîran û hevalên
xwe bike .
- 192) Berê ji xwe re , pê ve meriyên xwe re , pê ve dora xwe
re .
- 193) Heke dilê hakim li peyayên wî xira dibe ; peya mîfsid
dibin .
- 194) Di roja piştawiyê de , li ba Xwedê mirovên xirabtir
ew in ko du rû û riyakar in .
- 195) Heke kesekî gulek da we lê vemegerînin , kulîlk ji bi -
hustê derketine .
- 196) Heke ji we sê mirov bi rê ve diçin bila yekî ji wan sê
rekîtiya ên mayin bike .
- 197) Her vexwarina ko serwexê dike heram e .
- 198) Mirovên bikêrnehatî pirsên ne qenc dikin ta ko zana pê
şaş bibin .
- 199) Ez mizgîniyê didim we û hon jî , ji yên di pê xwe re
mizgîniyê bidin ; heçî ko baweriya xwe bi yekîtiya Xwedê
anîne wê bikevin bihustê .
- 200) Dîn ji sê texlît mirovan zererê dibîne ; ji zanayên bi
tevdan , ji hakimên bi zîlm û zînat û ji xebatkerên ne -
zan , yên ko bê rê û tertîb dişixulin .
- 201) Ko zanîn hate ji bîr kirin xira dibe , ko nehêja hînî
wê bûn winda dibe .
- 202) Erna Xwedê , ji helalan , berdana jina ye .
- 203) Helaliya ko Xwedê jê dixeyide berdana jina ye .
- 204) Xwedê ji mirovê ko di neyariyê de har e , hez na ke .
- 205) Bikêrî bikêrnehatiyan werin .
- 206) Ho mirov , nanê te besî te ye , pê qail na bî ; ne bi
malê hindik û ne bi ê pir qîma xwe tînfî . Ko tu sax î ,
xwarina te jî têrî te dike , bila diniya ko bi eqlê te
dikene û te dixapîne xira bibe .
- 207) Kurê jinikekê ji mîletê wê ye .



- 208) Mizgeftên xwe bê xelm û rewş , lê gund û bajarên xwe bi xelm û zînet ava bikin .
- 209) Cebrail hat û gote min : Herwekî dixwazî bijî dawiyê bimirî , ji kê dixwazî hez bike dawiyê jê veqetî , herwekî dixwazî bike tu ê pê berpirsiyar bibî , serfiraziya bawermendên ew e ko bi şev bi ibadetê mijûl dibin û hewcedarê xelkê na bin û çavê xwe na din ber deriyê xelkê .
- 210) Bi malê sêwiya ticaretê bikin ta ko malê wan bi dana zekatê kême be .
- 211) Heke hon dixwazin dilê we nerm û çak be û îşê we here serî , li ber sêwiya bikevin û ji wan hez bikin , xêrxwazê wan bibin , dilê wan xweş bikin û ji xwarina xwe bidin wan ; pariyê devê xwe bidin devê wan .
- 212) Pez bi xwedî bikin , bi xeyr û bereket e .
- 213) Hon dizanin pîsîti çî ye ? Pîsîti ew e ko mirov gotina yekî ji ê din re dibêje ; ta ko ew li hev kevin .
- 214) Dev ji heramiyê û ji heramê xelkê berde ta ko tu serfiraz bibî , bi mal û rizqê xwe qîma xwe bîne ta ko tu dewlemendtirê mirovan bibî , qencyê bike cîranê xwe ta ko bawermend bibî , tiştê ko ji bona nefsa xwe dixwazî ji xelkê re jî bixwaze ta ko misilman bibî ! Pir me kene dil pê dimire . (Mirovên bêeqal pir dikenin) .
- 215) Ji Xwedê bitirse , tu qencyê kême me bîne , gava avê ji birê dîkşînî ko ava setila te rijiya setila hevalê te , ew jî ji we re qencyek e , xweşkirina dilê xelkê jî qencyek e , kubariyê me ke , Xwedê ji nefsmezîna hez na ke , heke kesek , bi kêmasiyekê ko tu jê bêrî yî , qedrê te dişkinîne , tu eyba wî me de rûyê wî , berde bila ew pê gunehkar bibe û sewaba kirina te , ji te re bimîne , dijûna me ke tu kesî .
- 216) Misilmanê ko ~~têkila~~ xelkê dibe û derdê wan dikişîne , ji yê ko rûyê xwe ji wan diguhêrine û li ber derdê wan na keve çêtir e .

- 217) Ji Xwedê bitirsin û xwarin û vexwarina heywanên bidin wan , wan paqij bikin , bê sebeb wan me westînin û me êşînin ; ta ko bikêrî xebat , siwar bûn û şerjêkirinê bîn .
- 218) Ji Xwedê bitirsin û di heqê zaroyên xwe de qenc û adil bin .
- 219) Bi qenciyeke , bi dana nîv xurmeyeke ji be , xwe ji agirê dojehê biparêzin , sedeqe mirovan ji agirê dojehê diparêze .
- 220) Kafir ji be , ji nifirên bêşûcan bitirsin , di nav bey-na wan û Xwedê de , tu perde nî ne .
- 221) Ji eqilmendiya bawermendên pak bitirsin , di çavê ba - wermendan de roniya Xwedê heye .
- 222) Xwedê di roja qiyametê de li du texlît mirovan na ne yi-re , yên ko qedrê mirovên di xwe nî zanin û li wan na ge-rin ; li gora bayê serê xwe dimeşin û ji yên ko cîranên xwe aciz dikin , qenciya wan vedişêrin û xirabî û kêma - siyên wan rê xelkê didin .
- 223) Dido ji yekê , sisê ji didowan û çar ji siseyan çêtir in , ji civan , yekbûnî û yekîtiya xelkê hez bikin , Xwedê xelkê di dora yekîtiya xwe de dicivîne .
- 224) Ji heft tiştên neqenc ko xelk pê diçin helakê xwe bipa-rêzin . : Ji mişrikiyê , ji sihirbaziye , ji kuştina xelkê bêrê , ji xwarina malê sêwiyan û faizê , di şer û qewi - mandinê de , ji bazdanê , û ji kêmkirina qedrê jinên xwedê namûs û ji paşgotiniya wan .
- 225) Dest ji zinaya ko Xwedê haram kiriye bikişînin , heke we ew kir emelê xwe ji xelkê vaxê xweyê xweyê hon mikur hatin hon ê bêne recimandin .
- 226) Ji dinya we sê tişt bi min xweş in : pîrek , bihna xweş û mirovên nîmêjker .
- 227) Xwedê hindik ji be ji wê xebatê hez dike ko roj pê de tête çêkirin .

- 228) Xwedê berî her tiştî ji cihanîna ferzên diyanetê û di pişt re ji wî karî hez dike ko mirov pê dilê xelkê şa dike .
- 229) Ko hon hatine vexwendin herin , diyariya xelkê lê ve - megirînin û li xelkê me din .
- 230) Heke heq û rast bû ko hon li mirovekî bidin li rûyê wî me xin .
- 231) Ji xelkê ne seba menfeeta xwe lê ji bo Xwedê an ji bona tiştêkî heq û rast hez bikin an bixeyidin .
- 232) Gotina min a spehîtir gotîna a rastir e .
- 233) Sifra spehîtir li cem Xwedê ew e ko xwarinxwerên wê pir in .
- 234) Tiştê ko tu ji nefsa xwe re dixwazî ji xelkê re jî bi-xwaze û tiştê ko tu ji bo nefsa xwe na xwazî ji bona xelkê ji me xwze .
- 235) Hevalîtiya xwe de bi tevdir be ; heye ko rojekê dostê te dibe dijminê te , dijminahiya xwe de nerm be ; heye ko rojekê dijminê te dibe dostê te .
- 236) Li rûyê mirovên ko pesnê we didin axê birejînin .
- 237) Tiştê ko pesinker dixwazin bavêjin devê wan .
- 238) Cilên pak û spehî li xwe bikin , li heywanên spehî siwar bibin ta ko çavê xelkê pê şa bibe .
- 239) Hêj milletê min ji çar adetên dema nezaniyê ne geriyaye; bi navê bav û kalê xwe pesnê xwe didin û mirovên ko ne ji malbateke mezin in , kêfî xwe dibînin û qedrê wan na girin , li stûran dînerin û dildikin pê dema daketîna baranê bizanin , gava li pê darbesta miriyan diçin girî û şîn di-kin . Divê ew dev ji wan tiştan, berdin .
- 240) Ko sê mirov tevî hev rûniştine ji wan her siyan dido divê bi dizî ne peyivin û hevalê xwe pê aciz ne kin .
- 241) Gava hon ji xwê radibin sê caran destê xwe bişon û di pişt re dest bavêjin tiştan ; hon ni zanin , di xew de , destê xwe li kû datînin û ji kû hiltînin .

- 242) Qedrê bavê xwe bigirin an ne Xwedê ronahiya siûd û xweşiya we ditemirîne . mal
- 243) Hakim bi standina/û peran zalim û qazî bi xwarina bertîlan kafir dibe .
- 244) Sê tişt dikarin miletê min bibine helakê : zikmezîni , xewa pir û betalî .
- 245) Gava hon tiştêkî dikin bi pakdiliyê bikin an ne Xwedê pê qail na be .
- 246) Heke tu dewlemend î , Xwedê dixwaze ko tu dewlemendiya xwe , bi rêz û tertîb , şanî xelkê bidî û pê arîkariya wan bikî . Xwedê ji mirovên ko dewlemend in , ~~tiştên wan~~ ji xelkê vedîşêrin , hez na ke .
- 247) Xwedê ji mirovên gazinker hez na ke . Mirovê ko xwe avêtiye bextê te me kuje .
- 248) Heke hon qenciyeke bixwazin ji mirovên rûspehî bixwazin .
- 249) Gava hon ji min re qasidekî dişînin mirovekî bişînin ko nav û rûyê wî spehî ne .
- 250) Ko xadima we ji we re xwarina we anî , binin bîra xwe ko wê bi hilm û bihna wê xwarinê dilê xwe xurt û şa kiriye , berdîna bila ew jî bi we re bixwe an jê çend pariyan bide - ne wê .
- 251) Gava yekî xanedan û malvekirî tê nik we qedrê wî bigirin.
- 252) Gava Xwedê qenciya yekî dixwaze , cihê wî bilind dike û wî dike arîkarê xelkê .
- 253) Heke hon dixwazin qedrê yekî li cem Xwedê çî ye bizanin çav bidêrin û binêrin gelo xelk di heqê wî de çî dibêjin .
- 254) Ko te xirabiyek kir qenciyeke li pey wê bike : qenci xerabiyê dişo .
- 255) Ko du misilman pev çûn û yekî ê din kuşt her du jî dike - vin dojehê .
- 256) Gava du misilman rastî hev têndivê silavan li hev bikin , li halê hev bipirsin , pesnê Xwedê bidin ; ko wan ew kirin Xwedê di gunehên wan dibore .
- 257) Tiştê ne bi dilê te be me ke .



- 258) Gava mirovek tişteki dibêje û li dora xwe dinêre , yê ko dibihîse divê bizane ko ew gotina he emanet e , ji tu kesî re na yê gotin .
- 259) Ko Xwedê kar an xebatek da we heta ko ew xwe bi xwe ji destê we ne çû dev jê bermedin. "Mirov divê di xebata xwe de , pê bide erdê û tê de , pêş ve here " .
- 260) Heke tu bi kirina xwe a qenc şa û bi a kirêt şermisar dibi bawermend î , mirovekî pak û paqij î .
- 261) Heke hon dibihîsin ko mirovek dibêje xelk hemî bêfesal in; bizanin ko yê bêfesal ew bi xwe ye .
- 262) Xelkê dora te , di heqê te de , herwekî dibêjin tu wiha yî.
- 263) Heke we bihîst ko çiyayek ji cihê xwe rabûye bawer bikin ; lê heke dibihîsin ko mirovek eslê xwe guhartiye bawer me kin.
- 264) We bihîst ko , di welatêkî de êşek heye , me rin wî welatî û cihê ko hon tê de ne .êşek .lê peyda bû , jê dermekevin .
- 265) Heke misilmanekî li misilmankî şûr kişand heta ko ew şûr bikeve kalanê xwe Xwedê lanet li xwediye şûrkışandinê dike .
- 266) Ko te gunehê kir li pey wî xêrekê bike ta ko Xwedê pê gunehê te hilîne . (Xêr gunehan wînda dike .)
- 267) Gava hon dienirin heke hon ji piya ne rûnin , heke rûniştî ne vekevin .
- 268) Ko misilman li hev ketin ji bona lihevanîna wan bikebitin; heke hon pê ni karin tu caran hevalkariya zaliman me kin .
- 269) Ko camêrên we bûne mezinên we û comerdên we devlemendên we û hon jî îşê xwe bi şewiran dimeşînin jiyîn ji mirinê çêtir e ; lê heke awanên we dibin serekên we û çartengên we dew - lemendên we û îşê we dikeve destê pîrekan , mirin ji jiyînê baştir e .
- 270) Ko îş ket destê peyayên bêkêr , divê mirov hêvîdarê qiyametê bibe .
- 271) Qenciya miriyan bêjin , kêmaniya wan me bêjin .
- 272) Ez wisa dibînim , ko ji mirina min bi şûn de , hon miz - geftên xwe mîna kenîştayên cuhiyan û dêrên filan bixemilî - nîn , jê bigerin .

- 273) Ji dan û standina faîzê mezintir guneh ew e ko mirov paş -
gotîniya jin û mêrên bi namûs bike ; bi xirabiyê qala xelkê
me kin .
- 274) Xwedê li wan têtê xezebê , yê ko kirîn û firotina xwe de
sond dixwin ; belengaz in û pozbilindiyê dîkin , pîr bûne û
zinayê dîkin , wexta hikmê xwe de zilmê dîkin .
- 275) Timakarê dinyayê me be da ko Xwedê hejî te bike , çavê xwe
bera malê xelkê me de , ta ko xelk ji te hez bikin .
- 276) Ji Xwedê fedî bikin û ji bona tu tiştî destê xwe li ber
mezin û dewlemendan vemekin .
- 277) Beriya mirinê , hisabê mirina xwe bikin , kirin û gotina
we her çak û rast be .
- 278) Ji bona îşekî piçûk jî hevalkariya xelkê me xwazin .
- 279) Hinde ji destê te tê , tu xwe çêtir bike .
- 280) Her ji wicdana xwe bipirse , ew ê rastiye rê te bide , mi-
ftî pê qail ne be jî , ne tu xem e .
- 281) Girtiyan me êşînin , bi wan re qenc bin .
- 282) Di sûcên xelkê biborin ta ko xelk û Xwedê di sûcên we bi -
borin .
- 283) Bindeştiya mezinê xwe bikin , heke serê mezinê we hinga
mewîjekî piçûk be jî .
- 284) Xwedîmal Xwedê ye , yê ko bawer bike xwedî mal ew bixwe ye,
Xwedê xezeba xwe lê dike .
- 285) Heçî li dinyayê xurtî û çawsorî li xelkê kirine û ew êşan -
dine , di axiretê de zefh wê bêne êşandin .
- 286) Şikirdarên Xwedê ew in ko gava qenciya xelkê dibînin şikir-
darê wan dibin .
- 287) Dev ji ehmeqan berdin .
- 288) Heke we ew pênc tişt anîn pê ez ê mizgîniya bihustê bi we
dim ; di parkirina mîratê de neheqiyê me kin , ji nefsa xwe
bêtir bi xelkê re bi însaf bin , di dema şer û qewimandinê de
xwe jê me din paş û baz me din , gava talanê dijminan bi dest
we dikeve xaintiyê lê me kin û jê ji xwe re bê rê tişteki hil -
meyînin û heqê bêçareyan ji zaliman bistînin .

- 289) Mala we vekirî û zmanê we şîrîn be .
- 290) Keda helaltir keda dest e ; dan û standin jî qenc û bi xêr û bereket e .
- 291) Bi dilekî pak ibadeta Xwedê bike û tu tiştî me ke hevber û hempayê wî , nimêjên xwe ên ferz bike û heke zekat li ser te ferz e zekata xwe bide ; heke hec li te ketiye , here hecê û ayîna emrê pêk bîne ; rojiya meha remezanê bigire ; tiştê ko tu dixwazî xelk ji te re bikin tu jî ji wan re bike û tiştê ko tu ji xwe re na xwazî , ji xelkê re jî me xwaze .
- 292) Ibadeta Xwedê bikin û tu kesî me kin hevber û hempayê wî , gava dest bi karekî dikin xwe di pêşberê Xwedê da bihesibînin û bi dilekî pak bixebitin û bînin bîra xwe heke hon wî na bînin ew we dibîne ; li mexlûqên Xwedê fetkirin û mezinahiya Xwedê seh bikin , ko te gunehê kir li pey wî qenciyeke bike , heke te ew guneh bi dizî kiriye qenciya xwe jî ni dizî bike , lê heke te ew guneh bi êşkere kir , qenciya xwe jî êşkere bike .
- 293) Ji nifirê bêşûcan bitirsên , Xwedê diayê wan qebûl dike .
- 294) Navê kal û kalikên xwe bizanin ; ji mirovên di xwe hez bikin , herin ziyareta wan , ji wan me gerin .
- 295) Tişt miştan mavêjin rê û tiştên ko xelk pê aciz dibin jê hilînin .
- 296) Jina qenctir û delaltir ew e ko qenaetkar e .
- 297) Jin divê qedrê mêrê xwe û deya wî bigirin .
- 298) Hema dest bi karê xwe bikin , hon ê bibînin , Xwedê îşê we pêk tîne .
- 299) Berî ko ji destê we derkevin qedrê pênc tiştan bigirin ; berî mirinê qedrê jiyînê , berî nexweşiyê qedrê saxiyê , berî xebatê qedrê rahetiyê , berî pîriyê qedrê ciwaniyê , berî belengaziyê qedrê dewlemendiyê , an ne hon ~~posman~~ ^{bin} di-
- 300) Parsek ne peyar , siwar be jî tiştêkî bidin ê .

- 301) Ko we sedeqa xwe ji dizekî re , ji jinikeke zinakar re an ji dewlemendekî re jî dan , we rast kiriye ; an ew ê pê ji xirabiya xwe xelas bibe an jê ibretekê bigire .
- 302) Jin divê bê destûra mêrê xwe ji malê wî tîstekî me de xelkê .
- 303) Li ser rê me sekinin û ma xêvin ; heke disekinin divê li jinên xelkê me nêrin , rê bidin mirovên ko tê re diborin , silava xelkê li wan vegerînin , qenciye bikin û ji xirabiyê bigerin .
- 304) Di civatekê de tu kesî ji cihê wî ramekin û li şûna wî rûmenin .
- 305) Gava hon li cara evîl rastî kesekî tên û jê hez dikin divê jê re bidin zanîn .
- 306) Hon brayê hev in , arikariya hev bikin , rastiye bêjine hev û li hev xedariye me kin .
- 307) Zalim be , mezlûm be , arikariya hevalê xwe bikin , ko mezlûm e ; wî ji zilmê xelas bikin , ko zalim e bermedin ko ew zilmê li xelkê bike .
- 308) Ko te di ciwaniya xwe de qenciye bi pîrekî kir , di pîrîniya te de Xwedê , bi destê ciwanekî , qenciye digihîne te.
- 309) Qedrê her kesî li gora qîmeta wî bigirin .
- 310) Silavan li hev bikin ; bi vî awayî hon ê ji hev hez bikin.
- 311) Silavan li hev bikin , dest vekirîbin , xelkê vexwînin cem xwe û herwekî Xwedê emrî we kiriye , ji hev hez bikin , bibin brayên hev û du .
- 312) Piştî îmanî , tistê çak ev e ko xelk hejî hev bikin .
- 313) Îmanê çêtir ew e ko mirov di tengiyê de sebrê bi xwe bide û dest vekirî be .
- 314) Pereyê çêtir ew e ko mirov jê berî ji bona rizqê jin û zaroyên xwe , paşê jê ji bona emê hespê xwe yê ko di pişt wî de di reya Xwedê da şer dike , di pişt re jê ji bona hevalê xwe serf dike .
- 215) Qenciya ko hon dixwazin bikin , di dema saxiya xwe de bikin , ko we wesiyet kir , êdî Xwedê dizane , gelo di pişt mirina we

re , daxwaza we tète cih an ne .

- 316) Ji sedeqeyên qenc yek jî ew e ko mirov hînî tiştêkî çak bibe û mirovekî di hînî wî tiştî bike .
- 317) Keda çêtir ji dan û standina pak û ji keda xebata destan û xwehdana eniyan tê .
- 318) Bawermendên çêtir ew in ko exlaqê wan baş e .
- 319) Bawermendên^{ew} çêtir in ko kirîn û firotina xwe bi camêriyê dikin , deynê xwe bê zehmet didin û xwe diyê deynê xwe aciz na kin û deyndarên xwe na şidînin û na êşînin .
- 320) Heqî eqilmend in , serdestê hevalê xwe dibin .
- 321) Pir me rin , me yin mala dewlemendan .
- 322) Pir me bêjin li qisûra min me nêre , hon ê dawî derewan bikin .
- 323) Li qisûra comerdan me nêrin ko peyê wan şemitî , Xwedê wan digire û bernade ko bikevin .
- 324) Gunehên mezintir ew in : mişrikî , kuştina xwelkê bê rê , asê bûna dê û bavan ; dana şehdetiya zor .
- 325) Di roja piştawiyê de piraniya xelkê ji ber gotinên bêrê û beredayî wê bêne êşandin .
- 326) Dev û diranê xwe her paqij bigirin .
- 327) Bila mirina we tim di bîra we de be , dilê belengaza pê rahet dibe û pozbilind jê ibretê digirin û eqilmend dibin .
- 328) Mirovên mezintir ew in ko ji Xwedê tirsîyar in ..
- 329) Qedrê nanê xwe bigirin .
- 330) Bawermendê çêtir ew e ko exlaqê wî baş e û xeyra jina xwe dixwaze .
- 331) Jina bi zar û zêç ji jinikeke ~~spasî lîbûê~~ ~~zardocê~~ ~~tiirec~~ ..
- 332) Qencyê berî ewilî ji deya xwe re bike , paşî dîsa ji deya ~~xwe~~ re bike , cara sisiya dîsa ji deya xwe re bike , di pişt re ji bavê xwere û pişt re li gora nîzikahiya wan ji mirovên di xwe re bike .
- 333) Xwedê ji sê evdên xwe hez dike , hakimê adil , mirovê ko ibadeta wî dike û yê ko kesî na ke hevberê wî .

Xwedê/^{ji}sê evdên xwe dixeyide : mirovê durû ko paş-
gotiniya xelkê dike , yê ko bê rê ji xelkê pir di -
pirse û yê ko ziaker e .

334) Xwedê dibêje : Gava du mirov bi dilekî pak şirî -
kê hev in ez bi wan re me , lê heke dilê xwe li hev
xira dikin , ez ji wan digerim .

335) Di roja piştawiyê de Xwedê ji evdê xwe re dibê -
je : Ez ne sax ketim , te serek li min ne da ; Ez
birçî bûm , te xwarin ne da min ; Ez ketim tengi -
yê , te li min ne pirsî ; evdê wî jê re dibêje :
Xudayê min , ma min çawan dikarî ez bizanim ko ew
tişt hatine serê te . Xwedê lê vedigerîne û dibêje:
Gava car û cîranê te nesax ketin tu ne çûyî serda -
na wan , ko birçî man , te li wan ne nêrî , ko ke -
tin tengiyê , te arîkariya wan ne kir , ma ev jî ne
mîna wî ye .

336) Bi serê bav û brayê xwe sund me xwin .

337) Xwedê emrî we dike , divê hon qedrê jinan bigi -
rin , ew dê û dot û metên we ne ; ma hon na bînin
file ji xwe re jinekê mehr dikiñ û heta mirinê jê
na gerin .

338) Xwedê spehî ye û hejî her tiştê spehî dike .

339) Pêşîgera xaniyên xwe paqij bikin , mîna cuhiya
rêvin me bin .

340) Xwedê di gunehên xelkê dibore û ji mirovên ko
di sûçên xelkê diborin hez dike .



- 341) Xwedê bi deyndara re ye , bi wî şertê ko deyndar pereyê xwe bê rê zia me kin .
- 342) Xwedê li rû û malê di we na nêre , lêbelê li dit û emelê we dinêre .
- 343) Xwedê ji arîkarê hewcedaran hez dike .
- 344) Xwedê di her tiştî de ji xwediye sebrê hez dike .
- 345) Xwedê ji mirovên ko bawîşka tînin hez na ke .
- 346) Xwedê ji mirovên bi vên û xeyret hez dike .
- 347) Heke jin û mêr li hev dinêrin , dilê wan pev re rast e hejî hev dikin Xwedê jî li wan dinêre , li wan tê rehmê û li gora dilê wan dide wan . Heke jin û mêr destê hev digirin û pê şa dibin , Xwedê gunehên wan ji destê wan diwe - şîne û ew ji gunehên xwe pak dibin .
- 348) Bi exlaqekî baş mirov digehe dereca mirovên ko hero rojiyê digirin û bi şev ibadeta Xwedê dikin .
- 349) Bawermend ew e ko bi şûr û bi gotina xwe cihadê dike , rastiye dibêje .
- 350) Li cem nesaxa pir rûmênin û bi dengê bilind ma xêvin.
- 351) Mirovê ko destek cil dide belengazekî rût , di axiretê de Xwedê lê tê rehmê .
- 352) Bizane , çawan divê tu hevalê xwe bibijêrî .
- 353) Ko te seye xwe şand û wî nêçîrek ji te re girt , jê bibe û bixwe , lê heke seye te çû ji xwe re nêçîrek girt , wî jê me be , ew rizqê wî ye .
- 354) Parsekî heram e , meger ko izreke mezin hebe . . .
- 355) Jin ji parsûkê xwar hate afirandin , heke tu dixwazî wê rast bikî tu ê wî bişkîninî , bi sebr û nermiye pê re bi - de bistîné .
- 356) Gava cenaze derbaz dibe ji ber wî ve rabin . (Rabin ser xwe .)

- 357) Wada xwe bîne cih , bawermend wiha dikin .
- 358) Mirovên ko xelk ji xirabiya wan ditirsin , di roja piş -
dawayê de , li bî Xwedê bê qedr û rûmet in .
- 359) Sebr û dilnêrmî du xisletên hêja ne .
- 360) Mirovê ko diyariyekê dide kesekî û paşê jê distîne , mî-
na seyek e ko vedirêşê û di pişt re tiştê ko vereşandiye
dixwe .
- 361) Gunehên mezintir ew in ko mirov mişrikiyê bike , ango
yekîtiya Xwedê nas me ke , li dê û bavê xwe asê bibe ,
sundên derewîn bixwe û pêşberê qazî de , piştî ko bi anî-
na navê Xwedê sund xwariye , derewan bike û pê bi qasî
mûyekî jî be , ziyane xelkê bike .
- 362) Bi tenê bi malê xwe hon ni karin arîkariya xelkê bikin .
Bi exlaqê baş û bi gotinên şîrîn ew razî dibin .
- 363) Ko min di heqê meselekê de hikmê xwe da û xelet kir , di-
vê ji bîr me kin ko ez jî mirovek im , dikarim xeletekê
bikim , lê ji ber ko min xelet kiriye heqê xwedîheq winda
na bê û yê ko dizane dawa wî ne heq bû , divê jê bigere ,
tiştê ko mirov bê heq û rê dibe , perçek agir e ; êdî hon
dizandin , bibin an berdîn .
- 364) Miletên berî we mehiw bûne , ji ber ko gava mezinckî ji
wan zilm û dizî dikir ew berpirsiyar ne dikirin û ko be -
lengazekî tiştêk dikir , lê radibûn û diêşandin .
- 365) Heçî di civatekê de rûniştî ne sundxwariyên hev in (bext-
dayiyên hev in) galgala ko di civatekê de hatiye gotin ,
ji xelkê re me bêjin , ew tiştêkî haram e .
- 366) Berî ko bikevin mala yekî destûra wî bixwazin .
- 367) Xwedê bi mirovên mihriyan tê rehmê .
- 368) Ez jî yariyê dikim , lê dîsa rastiye dibêjim .
- 369) Ne îşê min e ko dilê xelkê gul bikim û bizanim tê de çi
heye .
- 370) Tu û malê xwe tev da hon aidê bavê xwe ne .
- 371) Heqê du kesên qels ji we re zehf haram e , heqê sêwîyan
û heqê jinan .

- 372) Di dinya û axiretê de kes ji min bêtir ne nîzîkî Îsa, kurê Meryemê ye , nav beyna min û wî da tu pêxember danehatiye , pêxember tev de ji bavêkî ne , bi tenê daya wan cihê ye û dînê wan yek e .
- 373) Ez ji mirovên ko gava belayek tê serê wan li serê xwe dixin û porên xwe dikişînin , cilên xwe diqirînin û diqetînin , bi dengêkî bilind ax û zarînan dikin û digirîn pak û bêrî me.
- 374) Yê ko sêwîyan dihevine , di bihustê de , bi min re ye .
- 375) Îşê dinyayê hon ji min çêtir dizanin .
- 376) Vexwarîna ko heke we jê pir vexwar serxweş dibin ji we re heram e .
- 377) Pir me bêje , pir me kenê , ji feqîr û belengazan hez bike , bi wan re rûne , xêrxwazê wan be û arîkariya wan bike ; zehmet be ji her rastiyê bibêje , qedrê mirovên ~~q~~ xwe bigire , ew ji te bigerin ji , tu ji wan me gere , gava tu diênirî , bi xelkê re me peyive , kêmaniyên xwe bizane û bi kêmaniya xelkê mijûl me be , paşgotîniya hevalên xwe me kê , bi gotin , û rabûn û rûniştina xwe hevalên xwe aciz me kê , bêt ko bi te bikeve sund me xwe .
- 378) Qedrê cîranê xwe bigirin û wan aciz me kin .
- 379) Di ziwaca xwe de bi pezekî jî be , dawetê bike .
- 380) Ez ê ji nimêj , rojî û zekatê çêtir tiştêkî rê we bidim ? Ew li hev ahîna mirovan e ; bi şer û pevçûnê xelk winda dibin .
- 381) Ez ê rê bidim we , mêrxas û egîdê we kî ye ? Mêrxas û egîd ew e ko gava diênire li cihê xwe giran e , û bi nefsa xwe dikare .
- 382) Ji gotin û kirîna ko , di dawiyê de , tu ê poşman bibî , jê bigere .
- 383) Ji gotin û emelên ko guh jê diqehire , dûr here .
- 384) Di mesela diyanetê de pir kûr ma jon , mîletên berî we , pê dînê xwe winda kirîne .
- 385) Hingî we sîr û pîvaz xwar derbazî mizgeftan me bin (xelk ji bihna sîr û pîvazê aciz dibin) .


- 386) Derewan me kin , derew ji baweriyê dâr diçe , dîn û de -
rew na bin yek .
- 387) Ji jina ko dixwaze bê sebeb dev ji mêrê xwe berde , bih-
na bihuştê heram e .
- 388) Mezin û hakimên ko xelkê xwe dixapînin divê bizanin ko
para wan dojeh e .
- 389) Deya ko sê zaroyên wê mirine , divê bizane , ew sê zaro
navbeyna agirê dojehê û deya xwe de dibin beden , deya wan
rûyê agirî na bîne .
- 390) Mirovên camêr û ewle dibin xwedî mal û rizq , xwedî nav
û rûmet , bêbext şerpeze û perîşan dibin , meydana bêbex -
tan tu ne ye .
- 391) Heke tu xeyr û bereketa xwarinê dixwazî , berî û piştî
xwarinê destên xwe bişo .
- 392) Xwarina dawetekê a bê qedr û qîmet ew e ko dewlemend jê
dixwin , çavê feqîran lê dikeve û jê mehrûm dimînin .
- 393) Mirovên xirab ew in ko meyvanên wan nî ne .
- 394) Qencî wînda na be , xirabî jî na yê ji bîr kirin , Xwedê
jî her heye , êdî çawa wan dixwazî bike .
- 395) Tiştê ko dilê te pê rahet dibe bike , û ji tiştê ko dilê
te pê rahet na be , bigere , heke miftî bi awakî dî fetwa
bide jî guh me dê .
- 396) Ko hon dibînin rastiyê bêjin , îşê we xira bibe dîsa ji
rastiyê xwe vemegêrînin û bizanin ko îşê we her wê bimeşe
û heke dibînin ko derewan bikin îşê we bimeşe , dîsa ras -
tiyê bêjin û bizanin ko îşê we pê xira na be û dîsa dimeşe .
- 397) Heke te di dema Xurtiya xwe de Xwedê nas dikir , Xwedê jî
di dema qelsiya te de , te nas dike .
- 398) Têcirê xwedînanûs hevalê pêxemberên û çalê Xwedê .
- 399) Têcirê tirsonek kar na ke , têcirê çavsor xurt û dewle -
mend dibe .
- 400) Xwedê li mirovên ko bi qels û belengazan ra dilnêrm in ,
qedrê dê û bavê xwe digirin û dilê xadim û xulamên xwe
xweş dikin , tê rehmê , û ew dikevin bihuştê .

- 401) Ko mezinê we ji we tiştêkî zêdeyî heq û insafê xwest , bi xebera wî me kin .
- 402) Xwedê arikariya wan mirovan dike ko ji xwe re an jinekê tînin an erdekî beyar dajon û diçînin .
- 403) Xwedê li mirovên ko bi nekesan re jî comerd in , di sûçên xelkê diborin û dilê xwe li wan vedikin û bi xadim û xula , mên xwe re dilbirehm in tê rehmê .
- 404) Mal bi danê kêma be , yê ko di tengiyê de , sebrê dide xwe , serfiraz dibe û yê ko tiral e , na xebite û hewcedarê xelkê dibe , dawî perîşan û şerpeze dibe .
- 405) Xwedê dibêje ez neyarê sê mirovan im ; yê ko bi navê min sund dixwe , wad dide û lê diqulipe , yê ko zaroyên xwe an zaroyên xelkê difiroşe , yê ko palekî ji xwe re tîne û piştî ko pale xebata xwe diqedîne heqê taba wî na de wî .
- 406) Mirov paşgotiniya sê texlît mirovan bike ne heram e :
PAŞGOTINIYA MIROVÊN BÊDÎN Û EXLAQ ;
PAŞGOTINIYA HAKIMÊN ZALIM ;
PAŞGOTINIYA MIROVÊN KO BI TIŞTEN KO XWEDÊ Û PEXEMBER NE GOTINE EMRÎ XELKÊ DIKE Û WAN PÊ ŞAŞ Û QÊJ DIKE .
- 407) Diyayê wan mirovan li ba Xwedê ne meqbûl e ; dia mirovê ko di xaniyekî xerab de radibe û rûdine û dibêje : Xudayê min , ji hilweşandina wî xaniyî min biparêze ; dia peyayê ko di rê û kûçan de dinive û dibêje : Xudayê min , min ji tada dizan biparêze û dia wî ehmeqê ko heywanê xwe girênade û ko ew baz da dibêje : Xudayê min , heywanê min ji min re vegeîne .
- 408) Xwedê , di roja piştawiyê de , li rûyê sê mirovan na nêre û bi wan re na peyive : YÊ KO DI ÇOLE DE AVA XWE A ZÊDE NA DE HEWCEDARAN , YÊ KO JI BONA FIROTÎNA MALE XWE BI DEREWA SUND DIXWE Û YÊ KO JI BONA KAR XWÊŞIYA XWE MEZINAHIYA MIRO - VEKÎ XEDAR NAS DIKE .
- 409) Xwedê li mirovên ko li ber dê û bavê xwe radibin û bêgoti - niya wan dikin , serxweş dibin û gava qenciyeke dikin di pişt re qala qenciya xwe dikin , na meyizîne .

- 410) Mirov dëynê xwe ne bi diayê lê bi hikmê qazî distîne .
- 411) Mirovên derewker , nefsmezin , durû û yên ko xirabiyê bi xar û lez dikin û qencyê bi şûn da dihêlin û paşgotiniya xelkê dikin , dikevin ber xezeba Xwedê .
- 412) Bi mezinan re rabin rûnin , ji mirovên zana bipirsin û li eqildaran bigerin ; têkilî wan bibin .
- 413) Malê hindik û zaroyên pir belayeke mezin e , arîkariya wan bikin .
- 414) Yên ko zad û xwarin û hûr mûrên ko xelk hewcedarî wan in tinin û ji xelkê re difiroşin , mîna mirov in ko di reya Xwedê da cihadê dikin , lê yeê ko ew biha difiroşin , mîna mirov in ko kitêba Xwedê inkar dikin .
- 415) Jin bi du giyanan dibin , şîr didin zaroyên xwe , bi di ^{ek} lekî rehm li zaroyên xwe digerin , heke ew qedrê mêrê xwe jî digirin û nimêja xwe jî dikin , bêşik dikevin bihustê .
- 416) Gava mirov ji tiştêkî zehf hez dike her û hor dibe .
- 417) Ez ji dinya we ji jinan û ji bihnên spehî hez dikim û çavê min ji nimêjê ronî dibe .
- 418) Şîretan li xelkê bikin , ta ko xelk ji Xwedê hez bike û ko xelk ji Xudayê xwe hez kirin , Xwedê jî hejî we dike .
- 419) Yên ko gava dev û destên xwe dişon navbira didan û ti - liyên xwe jî paqij dikin çiqas spehî ne .
- 420) Yê ko ji bona dîn û welatê xwe şer dike ji bona parastina wan şevêkê hişyar dimîne , xewê li xwe diherimîne , ji mirovê ko hezar rojî rojî girtiye û hezar şevî nimêj kiriyê çêtir e .
- 421) Qedrê jinên mirovên ko di reya dîn û welatê xwe de şer dikin mîna yê deya xwe bigirin .
- 422) Mirov qedrê xadim û xulamên xwe bigire , jê re xeyr û bereket e .
- 423) Mirov divê , ji qe ne ve , li hefteyê carekê ser û giyanê xwe bişo .
- 424) Pênc guneh hene ko bi kefaretê na yin şustin û ew mîna kufr in :

- 425) Hakimê qenc ew e ko hon ji wî hez bikin , ew jî hejî we dike û hon bibin arîkarê wî ew jî arîkariya we dike , ha - kimê neqenc ew e ko hon jê dixeyidin û ew jî li we na nêre , hon lanetê lê dikin , ew ji lanetan li we dike .
- 426) Qencên we ew in ko xwediyê gotîna xwe ne .
- 427) Çêtirên we ew in ko dilê mirovên di xwe xweş dikin .
- 428) Mirovê çêtir ew e ko bi kêrî xelkê tê .
- 429) Ziwaca baştir ew e ko xeyd û zehmet tê tu ne be , qelenê wê ne giran be .
- 430) Xortên we ên baştir ew in ko mîna mirovên seregiran in û kalên we ên xirab ew in ko pîr bûne û li ciwaniyê digerin .
- 431) Çaktirên we ew in ko xêrxwaz û xêrkarê jin û zaroyên xwe ne .
- 432) Camêr û mêrxas qedrê jina digirin , dilê wan na şkinînin , mirovên pîs û bêqedr jîna diêşînin .
- 433) Çêtirên we ew in ko ji bona din yayê dev ji axireta xwe û ji bona axiretê dev ji dinya xwe bernadin û ji xelkê re na bin bar .
- 434) Yê ko heqê xelkê bi timamî dide serfiraz dibe .
- 435) Dêza , xaltiyên we mîna deya we ne , qedrê wan bigirin .
- 436) Xelk hemî mirovên Xwedê ne , Xwedê ji nav wan , ji miro - vên ko ji hemiyar bêtir bi kêrî xelkê tên , hez dike .
- 437) Her xatirê mirovên xwe ên nesax bipîrsin , herin serîkî bidin nexweş û nesaxên xwe .
- 438) Deynîkirin kêmaniyeke mezin e .
- 439) Deynî nîrek e , gava Xwedê kêmaniya yekî dixwaze , wî nîrî datîne ser stoyê wî .
- 440) Destpêka eqildariyê tîrsa Xwedê ye .
- 441) Pîr hene bi şev nîmêjê dîkin û jê karê wan bi tenê kêm xew mayîn e û pîr jî hene her bi rojî ne û jê karê wan tîhn û birçî man e .
- 442) Pîr hene zîkê wan têr e , şikirdarê Xwedê xwe ne û ji mirovên bi rojî û birçî çêtir in .

- 443) Xwedê li mirovên pakdil û pakzman tê rehmê .
- 444) Herê, wekî mirov silava xelkê lê vedigerîne wiha ji divê cihaba kaxeza wan li wan vegerîne , ev heq û rast e .
- 445) Destê ko li ber te vekiriye vala vemegerîne .
- 446) Yê ko bertîla dide û yê ko distîne , mêvanê dogehê ne .
- 447) Yê ko li insan û heywana tê rehmê û bi dilekî xweş û birehm li wan dinêre , bila bizane ; Xwedê wê wer lê bi - nêre .
- 448) Xulqfirehî û dilbirehmî destpêka eqilmendiyê ye .
- 449) Yê ko bi dilekî pak ji yekî hez dike , bila bizane ko Xwedê jî hejî wî dike .
- 450) Pir li çûn û hatina xwe lezê me kin , hevalîtiya we wê bêtir bibe .
- 451) Herin goristanan , ber serê miriyê xwe , pê axiret tê bîra we .
- 452) Zina perîşanî ye .
- 453) Herin bigerin , laşê we pê rahet û sivik dibe .
- 454) Herin bigerin , bi rêke dûr û drêj herin , bedena we pê rahet û malê we bêtir dibe .
- 455) Destên xwe drêjî can , mal , namûs û şerefa xelkê me kin , ew ji we re heram e û hon pê kafir dibin .
- 456) Heft mirov hene ko her kes ji wan bigere jî , Xwedê dev ji wan bernade : yê ko bi dilekî pak nimêja xwe dike , yê ko jinekê spehî û dewlemend jê hez bike jî , ji tirsê Xwedê , pê re zinayê na ke , yê ko bi dilekî pak û rast ji hevalê xwe hez dike , yê ko gava qisûra xelkê dibîne çavên xwe digire , yê ko di dema şerî de tim li pêşiyê yê , yê ko qisûr û gunehên xwe her tîne ber çavên xwe û ji bona xelasiya nefsa xwe dixebite ; yê ko xêrxwazî xelkê ye û ariya wan dike .
- 467) Ne pir bikin , ne hindik bikin , bi can û bîr bikin .
- 458) Yê ko li dinyayê digere û bîrbîra zanîna dinyayê dibe , mîna mirovek e ko rojî digire .



- 459) Mirovên ko ji bona debara feqîr û belengazan dixebitin ,
mîna mirovên ko rojên xwe bi girtina rojiyê û şevên xwe bi
nimêjê diborin an reya Xwedê da şer dikin qedrgiran in .
- 460) Mirovê xirabtir ew e ko zana ye û neçê ye .
- 461) Comerdî darek ji bihuşt^{ye}/ya ko şax û guliyên xwe ber ra
erdê daye ; yê ko destê xwe davêje guliyên wê darê û co -
merdiyê dike , cihê wî bihuşt e ; û çavtengî darek ji do -
jehê ye û şax û guliyên wê li erdê xwar û marû bûne , yê
ko destê xwe davêje guliyên wê darê û çavtengî û serberjê-
riyê dike mêvanê dojhê ye .
- 462) Giran bin , giran bin , xulqfireh û baldrêj bin , Xwedê
ji giranî û dilrehmiyê hez dike , li xwe ma kin lez .
- 463) Mirov bi xulqfirehiyê digehe miradê xwe ; bi ecelê jê
mehrûm dimîne .
- 464) Mirovên xirabtir ew in ko ji malbateke dewlemend in , her
tiştê wan zehf û çak e ; paşî radibin henekê xwe bi xelkê
dikin û feqîr û belengaza kêmi xwe dibînin .
- 465) Mirovê xirab ew e ko zar û zêçên xwe di tengiyê de dihê-
le .
- 466) Mirovê ko xelk ji dest û zimanê wî ditirsin peyayekî xi -
rab e .
- 467) Ji bona mirovan du belayên mezin hene ; tîrs û çavtengî .
- 468) Ibadet û qenciya ko ji bona xapandina xelkê tête kirin ,
mişrikî ye .
- 469) Mirov pîr dibin lê , di hejkirina mal û saxiyê de , dilê
wan her ciwan dimîne .
- 470) Miriyê deyndar di gora xwe de girêdayî ye , ko deynê wî
hate dayîn , serbest dibe .
- 471) Sedeqa ko bi dizî tête dayîn , xwediyê xwe , ji xezeba
Xwedê diparêze .
- 472) Gava nimêja xwe dikin sola xwe ji peyê xwe me kin , me bin
mîna cuhiya .
- 473) Xewa sibehê dibe manî rizqê we .

- 474) Mirov bindestiya bavê xwe bike qey bendestiya Xwedê ki -
riye , lê rabûn , li ber Xwedê asêbûn e .
- 475) Xwarina yekî besî didiwa ye ; xwarina didiwa besî çara
ye , û a çara besî heşta ye .
- 476) Xwarina comerdeki şifa û derman e , a çavtengekî derd û
bela ye .
- 477) Heke mezin û zana şîreta li xelkê dikin heq û rast e ,
heke nezan wî îşî dikin , îşê bê rê û durûtiyê dikin .
- 478) Barê xelkê sivik bikin , giran me kin , nav di wan bidin,
keyreta wan meşkinînin .
- 479) Xwedê dev ji xelkê bêbext û tevloke berdide û li wan na
yê rehmê .
- 480) Xwedê pişt û qiwetê dide mirovên ko digehin hev û pev re
dixebitin .
- 481) Xwedê ji wan xebatkeran hez dike yên ko bi dil û can di -
xebitin .
- 482) Wext hene ko mirov tê de sebrê bide xwe , mîna agir di
mista xwe de bigire giran e .
- 483) Tirs we ji belayê na parêze .
- 484) Bawermend bêbextiyê na kin ; tu kesî na xapînin , hîleba-
ziyê li kesî na kin , li wada xwe na qulipin û li pê wada
xwe derin .
- 485) Destê xwe bê rê ma vêjin malê xelkê .
- 486) Mirovê ko mêvana na hewîne bêkêr e .
- 487) Xwedê ji xebatkeran hez dike .
- 488) Mirovên ko ne xebatker in bi kêrî dinya û axiretê na yin.
- 489) Xwedê arîkarê xebatkeran e .
- 490) Zekat û sedeqeyên xwe bidin peyayên ko ji ber qelsî û ne-
saxiyê bêçare ketine û nanê xwe ni karin ji keda destê xwe
bixwin .
- 491) Tu heywan , tu teyr , tu cih , tu roj û tu tişt ne bi
çifte ne , yên ko dibêjin ne were ye , derewîn in .
- 492) Xwarina we hazir be an îşekî we hebe dest bi nimêjê me
kin ; mirov divê nimêja xwe bi rahetî bike .

- 493) Yê ko gebahetan kiriye li qisûra xelkê na nêre ; yê ko dinya dîtiye xelkê nas dike , qedr û xatirê mirovan dizane.
- 494) Bi xwarin û vexwarinê zorê li nexweşên xwe me kin , me din ser kêfa wan û me tirsîn ko ew ji birçîna dimirin .(Kes ji birçîna na mire) .
- 495) Me enirîn , me xeyidin , nerm bin , bihna xwe fireh bi - kin .
- 496) Ko yekî dest bi kar û îşekî kir heta xelas kirina îşê xwe , qenc be , xerab be tu tiştî me bêjin , û dawiyê qe - rarekê li ser wî bidin .
- 497) Bi ketina hevalê xwe dilxweş me bin , tiştê ko Xwedê anî serê wî dikare bine serê we jî .
- 498) Jin cêrî jî bin li wan me din .
- 499) Ji avahiya dûr me çin û li cihên nepenî rûmenîn , yê ko lê rûdinin mîna miriyên merzelan - in .
- 500) Dijûniya li Iblîs me kin , sitariya xwe ji Xwedê bixwa - zin .
- 501) Galgalên neqenc ji miriyan re me bêjin .
- 502) Ji kesî re me bin serbar , heke hon siwar in û tajanga we ji destê we ket , hon bi xwe peya bin û wê ji erdê hi - nînin .
- 503) Tirbên miriya ji xwe re me kin ziyaret û mizgeft .
- 504) Gava mêvan tên ba we , bi tiştên li mal hazir be , qedrê wan bigirin .
- 505) Xwe dûrî xelkê me girin , ji mirovên xwe bidûr me kevin , dev ji zewacê bermedin , derê nepenî ji xwe re me kin cih û war .
- 506) Ji firax û piyan , tas û sêniyên zîv û zêr me xwin û vemexwin .
- 507) Tiştên mîna mehûj , behîv û nok yek li pê yekî bavêjin devê xwe , wan tiştê bi kulman me xwin .
- 508) Misilman xwediyê gotina xwe ne û pê têne nas kirin .
- 509) Misilman ew e ko xelk ji dest û zmanê wî ewle ne .
- 510) Para hîlekar û bêbextan agir e .

- 511) Mirovê ko pereyê wî hebe û deynê xwe ne de bêbext û zalim e .
- 512) Xwediye gotina xwe bibin û arîkariya Xwedê bixwazin .
- 513) Şîretker divê bi dilekî pak şîretan bide û bêbextiyê neke û galgala hate jê re gotin , bila ji devê xwe dernexe .
- 514) Mirovên pak zû têne xapandin , mirovên xerab xwe vedişêrin , xwe davêjin pişt diwaran , heta derb li wan nekeve .
- 515) Jin û mêr mîna kevîrên bedenekê ne , hev û du himbêz di-kin û qiwetê didine hev .
- 516) Yê ko xirabiyê dike , li saxiya wî xerabî tê pêşiya wî .
- 517) Heqî ji Xwedê na tirsin , ji xelkê jî fedî na kin .
- 518) Mirovê ko bi çavê rehmê li xelkê na nêre , Xwedê rehma xwe lê na ke , mirovê ko toba xelkê qebûl neke , Xwedê jî toba wî qebûl na ke , mirovê ko di sûçên xelkê na bore , Xwedê jî di gunehên wî na bore .
- 519) Heqî ko ji xelkê xeyr û qenciyê dibînin û şikiriya xwe bi wî xelkê na kin , şikirdarê Xwedê jî na bin .
- 520) Heqî ko li hemberê dijmina de heta şênanandina neyara an kuştina xwe çok didin erdê û berê xwe ji dijmina na guhêrin , di gora xwe de , na yin êşandin .
- 521) Heqî ko bi zar û tewleyê dileyizin , li ber Xwedê û pêxember asê dibin .
- 522) Xwedê ji mirovên ko bi cilên spehî , nefsa xwe mezin di-kin , dienire .
- 523) Şahidê ko şehdetiya xwe ne da , mîna şehdetiya zorê ye .
- 524) Heqî ko baweriya xwe bi axiretê anîne xelkê aciz na kin , zirara kesî na kin .
- 525) Bi zaroyan re li gora eqlê wan bimeşin , bi wan re bi-leyizin .
- 526) Heqî ko baweriya xwe bi Xwedê û bi axiretê anîne arîkariya cîranên xwe dikin .
- 527) Porên xwe bişon û bişkinînin .

- 528) Heçî ko bext dide mirovekî û wî mirovî dikuje , bêbex -
tiyê pê re dike , çavên wî li bihuştê na keve ; ew meyva-
nê agirê dogehê ye .
- 529) Heçî ko di nav xelkê de fesadiyê dikin , wan bera hev
didin , ne ji me ne , dûrî me ne .
- 530) Heçî ko xelkê dixapînin , hîlebaziyê li wan dikin , ne
ji me ne , dûrî me ne .
- 531) Heçî ko sêwiya dihevinin û wan bi xwedî û mezin dikin
para wan bihuşt e .
- 532) Heçî ko pîs û kêmaqil in , serê wan bê mejî ye , tim
ezabê xwe dibînin .
- 533) Senhetên xwe de pê bidin erdê , wî senhetê xwe me gu -
hêrinin .
- 534) Heçî ko roja tengayiyê de mîna şewat û rabûna avê , arî-
kariya xelkê dikin , Xwedê qedrê wan weke mirovên ko di
reya wî de hatine kuştin digire .
- 535) Xwedê ji mirovên nezan yên ko nezaniya xwe ni zanin û li
ser rûyê xwe dikevin , hez na ke .
- 536) Heçî ko bi dilekî rast û pak nefspiçûk in , Xwedê wan
mezin dike .
- 537) Xwedê ji mirovên ko di civatan de xwe dinepixinin , di
ser xelkê re rûdinin û bi giranî û qapanî bi rê ve diçin
hez na ke .
- 538) Heçî ko xebatên xwe bi bihnfirehiyê diqedînin , kar di-
kin , Xwedê poşmaniyê na de wan , lê heçî lez û bezê li
xwe dikin , meydana wan kin e , zererê dibînin .
- 539) Jinên pîr û stewr ji xwe re me yînin .
- 540) Li mirovên seqet û nesax bi çavên kirînê me nêrin , dilê
wan dimîne .
- 541) Kêfxweşiya xwe bi şer û kuştinê me yînin , lê ko hon
ketin şerî heta ko zora dijminê xwe bibin û wî bişkinînin
pehniya xwe bidin erdê û li cihê xwe giran bin .
- 542) Mirina xwe me xwazin .
- 543) Gava hon dikin rakevin agirê xwe bitemirînin .

- 544) Gava hon li nîşanê dixin , heywanan me yînin ber nîşa -
na xwe .
- 545) Yê ko silava xwe na de merhebabûn jê re na be .
- 546) Tîştê ko hon jê têşin me xwin .
- 547) Bi wî şertê ko mirov wezîfeyên dewlemendiyê pêk bîne ,
destvekirî be , dewlemendî hêja ye û xenl û zînetê Xwe -
diyê xwe ye .
- 548) Yê ko ne xwediye gotina xwe ye û li wada xwe diqulipe ne
mirovekî misilman û bawermend e .
- 549) Ko pere li cem we peyda ne bû tiştêkî me kirin , xwe ne
kin deyndarê xelkê .
- 550) Teneyî ji civata mirovên xerab çêtir e , lê hevaltiya mi-
rovekî qenc ji tenahîtiyê baştir e .
- 551) Xwelî li serê wî mirovê be ye ko bi derewa xelkê dike -
nîne .
- 552) Navbeyna du mirovan bê destûra wan rûmenin .
- 553) Ne li ser ava herikandî û ne jî li ser ava golê me mîzin.
- 554) Insan û heywana bi jehr , bi şewitandin û xeniqandinê me
kujin .
- 555) Jin û zaroyan me kujin .
- 556) Nezir û qurbana me kin , ko filan îşê min çêbû ji filan
pêxember û ewliya re qurbanekê şerjê bikim me bêjin .
- 557) Di şîna xwe de ax û zarînan û qîr û wîran me kin .
- 558) Heçî ko her ji koçeriyê hez dîkin dibin hovê serê çiya ,
yên ko her bi seyd û nêçîrê mijûl dibin ji kar û îşê xwe
xafil dibin û bi şûnda dimînin , mirovên ko her li pey me-
zinên dewletê digerin fitnekar dibin .
- 559) Heçî bêsebeb xaniyê xwe difiroşin ji wan peran xêr na
bînin .
- 560) Xwedê li mirovên ko gava tiştêkî difiroşin xerabî û kê -
maniya wî na bêjin tê xezebê .
- 561) Heçî ko xaniyê xwe difiroşin û bi pereyê xaniyê xwe xa -
niyekî na stînin xeyr û bereketa wan peran na bînin .



- 562) Heqî ko bihna rûn û goşt ji destên wan tê û bê destgus -
tinê radikevin û pê nesax dibin divê bizanin ko ew sûcda-
rê nefsa xwe ne .
- 563) Yê ko xurtî û çavsoyîyê li xelkê dike û bê heq malê wan
dixwe , ne ji me ne .
- 564) Wextê ko hon sîr û pîvazê dixwin gerek hon ne yin civatê
camêran .
- 565) Heqî ko bê destûra xwediye^{wan} /^{an}kaxez û defterên xelkê li
hev dixwe û li hundirê xaniyê wan dinêre û saxiya xaniyên
wan dike , divê bizanin ko xirabî û heramiyê dikin , heqê
wan ew e ko çavên wan bê rijandin .
- 566) Yê ko malê diziyê dikire bi diz re gunehkar dibe .
- 567) Yê ko nîşanvan e û dev jê berdide û avêtina tîfing û
nîşanê ji bîr dike ji nîmeta ko Xwedê da bû , wî mehrûm
dibe .
- 568) Tîştê ko sinet û Quran tê tu ne be înanîya xwe pê me
înin û pê emel me kin .
- 569) Heqî ko dixwazin xelk li ber wan rabe peya , bila hisa -
bê rûniştina xwe li agirê dogehê bikin .
- 570) Heqî ko bêsêbeb û bêheq mirovên ne misilman diêşînin ez
neyarê wan im û ez li axirê dawadarê wan dibim .
- 571) Heqî ko bêsêbeb û bê heq xelkê diêşînin , Xwedê , ji
xwe dixeyidînin .
- 572) Bêbextiya mezintir ew e ko mezinê welatekî bi zad û xwa-
rina xelkê ji xwe re ticariyê dike .
- 573) Li Incîlê hatiye nivîsandin : wek te bi wan kiriye wê bi
serê te jî bê ; wek te bi wan dikî ew jî wê bi te bikin .
- 574) Ji bona mirovên ko qencyê dikin masiyên behra jî dia
dikin .
- 575) Heqî dar û xerzan dişitilînin û erd û cotê xwe dikin
- 576) Xwedê qedrê wan digire .
- Yê ko dielime tiştêkî û bi xelkê na de zanîn , mîna miro -
vek e yê ko zêrên xwe vedişêre , dike bin erdê û pê arîka-
riya xelkê na ke .

- 577) Mirovê ko şîreta qencyê li xelkê dike û ew bi xwe qencyê na ke mîna çirayek e ko dora xwe reş dike û ronahî dide xelkê .
- 578) Heçî ko dilê wan di dana deynê wan hebe Xwedê arîkariya wan dike .
- 579) Ji qencyê hêjatir tiştek tu ne , qencîker mîna mirovek e ko her nimêja xwe dike û rojîya xwe digire .
- 580) Li ba Xwedê sedeqa mezin ew e ko mirov rastiyê bibêje .
- 581) Mezin hemî pêgirêdayî wê bîn hafa Xwedê , emelê wan ên qenc wan ji pêgirêdanê xelas bikin .
- 582) Yê ko di roja tengahiyê de bi kêrî hevalê xwe ne hat ko ew ket tengasiyê kes ji bi kêrî wî na yê , xwedîtiyê lê na ke .
- 583) Mirovê ko deriyê xwe digire li ber xîzan û belengazan , Xwedê deriyê rehm û koreme lê digire .
- 584) Xwedê mezinê mîletê ko li ser rast ne meşiyaye , ber bi rû ve davêje dojahê .
- 585) Tu dilê bê xem tu ne ye .
- 586) Sebr , baldrêjî û bihnfirehî zîneta mirovan e .
- 587) Xwedê di guncên tobedaran dibore .
- 588) Tirsê tu kesî ji mirinê xelas ne kiriye , feyda tirsê tu ne ye .
- 589) Du gur , hinde hakimekî zalim keriyî na eşînin .
- 590) Tu hinde xebata xulamê xwe sivik dikî , bi wî qasî Xwedê sewaba te bêtir dike .
- 591) Wesiyetê xwe binivîsînin û li cem xwe hilînin .
- 592) Yên ko qedrê kal û piçûk û zaroyên me na girin , ne ji me ne .
- 593) Yê ko gava cîranê wî birçî ye , zikê xwe dadigire û li cîranê xwe na pirse , ne camêr e .
- 594) Dewlemendî ne bi mal e , bi dil û comerdîyê ye .
- 595) Girtîna rojîyê ne ew e ko mirov dev ji xwarin û vexwerinê berde , lêbelê xwe ji gotin û îşê xerab jî bigire .

- 596) Xurtbûn ne bi dest û lep e . Xurtbûn ew e ko mirov wexta xeyda xwe de bi nefsa xwe bikare , ji devê wî dijûn derne-keve û ji destê wî xerabî çênebe .
- 597) Gotin û dîtin wek hev na bin .
- 598) Heqê siwara silava li peyan bike , heqê mirovê ji peya silava li ê rûniştî bike .
- 599) Heke Xwedê di gunehên peyayên ko heywanên xwe diêşînin û barê wan giran dikin biboriya , kes gunehkar ne dima .
- 600) Bi tenê bi gotina xelkê , bê delîl û îsbât divê kes kesî ne êşîne .
- 601) Heke hon tiştekî xerab di hundirê şikefta de ji dîkin , ew tê dîtin û bihistin , dev ji îşên xerab berdin .
- 602) Ji bona her derî mifta wî heye , mifta bihuştê ew e ko mirov ji piçûk û belongazan hez bike û li halê wan binêre.
- 603) Qurbana xwe bi anîna navê Xwedê û di reya Xwedê da şerjê bikin ; laneta Xwedê li ser wan mirovan be yên ko qurbana xwe li ser navê ewliya û enbiya , şêx û ziyaretê şerjê dîkin .
- 604) Yên ko hêviya xwe bi nivişt û berbejna dîkin , em dest ji ber wan hiltînin , bila berbejn û niviştê wan , wan ji tengasiyê xelas kin .
- 605) Milet hemî bi belayekê têşin , bela miletê îslamê ji hakimê zalim in .
- 606) Drêj me kin , kin û rast bibêjin , bi axaftina zêde û bêrê xelkê ji xwe aciz me kin .
- 607) Laneta Xwedê li wan be yên ko rû û laşê xwe dideqînin , birûyê xwe bi mûçinga zirav û drêj dîkin , porên li erdê mayî tînin û bi serê xwe ve dîkin .
- 608) Xwedê laneta li wan mirovan dike yên ko , di qehr û kerba xwe de , rûyên xwe bi neynûka diqelêşin , cilên xwe diqirînin û diqetînin û qîr û wîr dîkin .
- 609) Cilên xwe ên kevn û pînekirî li xwe bikin , lê nûyê xelkê li xwe me kin , xwê me xîr bin mineta xelkê .
- 610) Li ser tirba miriyan rûmenin , li ser sêla agir rûnin çêtir e.

- 611) Mirovê ko di dema saxiya xwe de xêr û qencikê dike , ji wî peyayê ko li ber mirina xwe du sed xêr û xeratan dike jî bi xêrtir e .
- 612) Xurtî û hikmê Xwedê ji ên we mezintir e , zor û çavso - riyê li xelkê me kin .
- 613) Xelkê di bin xwe re me gire , tu jî di bin emrê Xwedê de yî , û Xwedê ji te mezintir û xurtir e .
- 614) Gava hon rastî zarokan hatin silava li wan bikin .
- 615) Ma Xwedê wê çawan ji milletê ko peyayên wî ên qels û be - lengaz heqê xwe ni karin ji yên ji xwe xurtir bistînin hez bike û li wan bê rehme ?
- 616) Bixwînin , bielimin û li gora zanîna xwe bimeşin , bi gotina xelkê xwe şaş me kin .
- 617) Hakimên we jî li gora hozkirin û tifaqa we , li we di - nêrin , heke hon qedrê nefsa xwe ni zanin , tadayiya hev dikin , hakimên we jî we diêşînin .
- 618) Bixwin û vexwin çavfirehî û camêriyê bikin , lê bêrê pereyê xwe na vêjin çolê .
- 619) Xwarina xwe ji qiraxa firaxê bixwin , kevçiyê xwe ma - vêjin serê firaxê .
- 620) Hon hemî şivan in û pirsê keriyê we ji we dibe ; pirs û cihaba malê ji bav , ya xelkê ji mezinan û ya milletî ji hakimên tene kirin .
- 621) Hon hemî insan in û kalikê we Adem ji axa reş hate afirandin , bi navê bav û kalê xwe pozbîlindiyê me kin .
- 622) Xwe mezin me kin , mezinahî li gora kar û zanîne ye .
- 623) Yê ko bê heq û rê xelkê diêşînin , para wan dojah e .
- 624) Yê ko misilmanekî pak e dibe xerabî jê çêbibe , lê li kesî derew û bêbextiyan na ke .
- 625) Yê ko talanê xelkê tîne , heqê xelkê dixwe , cihê wî dojah e .
- 626) Her kes di dilê wî çî hebe wê kirî bike : qencîker bi qenciya xwe , derewîn bi derewê xwe , bêbext bi rûceşiya xwe , mêr bi nêraniya xwe , camêr bi camêriya xwe tene nas kirin .

- 627) Mal û xwîn û namûsa we li hev heram e .
- 628) Derewa me kin , dawiya derewê tu ne ye , hon pê dinya û axireta xwe bi zmanê xwe xera dikin , lê di sê tiştê de derow ne kêmanî ye , yek di şer de ji ber ko şer tep û hîle ye , a didiwa ; ji bona dilxweşkirina jina xwe , heta ko dilê wê ji mala wê ne reş be , a sisiya ; ji bona li hev hatina mirovan ji ber ko bi hev ketina mirovan xerabî û fesadî jê çêdibe , ko agir bi erdê ket gerek wî agirî mirov vemirîne , avkê li wî agirî bike ; ne ko mirov agir xweş û gûr bike .
- 629) Li xerabiya xelkê me gerin , ew ji bona we xeyreke mezin e .
- 630) Poşmanî ji niv tobak e , heke we guneh ne kirana Xwedê miletekî/^{di}xulq bikira heta ko gunehkar bibin û Xwedê di gunehên wan bibore .
- 631) Yê ko çavê wî tim li neyartî û xerabiyê ye , xeyra kesî na xwaze , gunehkar dibe û ew guneha ko Xwedê li ser stoyê wî daniye , besî wî ye .
- 632) Heke tu her tiştê ko bi guhê xwe dibihîsî û bi çavê xwe na bînî dibêjî , dawî , tu derewîn derdikevî .
- 633) Heke tu dibêjî ez heqê xwe temam distînim û tişteki xwe yê zêde bi ser wan de bernadim , wê gavê mirov dizane ko tu çavteng û temakar î .
- 634) Tirsê Xwedê elametê zanînê ye û ji xwe razî bûn û poz - bilindî ji destê nezaniya me ye .
- 635) Bi nav û dengê pêşiyên xwe , xwe mezin me kin , mezinahî bi camêrî û emelê qenc , bi zanîn û marifet e .
- 636) Heke hon eqilmend in , li pêş xwe , li dinyayê binêrin û jê ibretê bigirin .
- 637) Di sûçên deyndarên xwe biborin ta ko Xwedê ji di gunehên we bibihore .
- 638) Xwedê di gunehên mirovên ko li ser reya heq û راستiyê hatine kuştin dibihore .

- 639) Tiştên rast û hêja ko hon pê dizanin binivîsinin , ta ko ew tişt wînda ne bin , û xelkê dawî jê aqildar bin .
- 640) Îşê xwe bi asas deyne , paşî bispêre Xwedê .
- 641) Bêjin : Xudayê me efiwa te ji gunehê me mezintir e , em hêvîkarê comerdiya te ne .
- 642) Bêje : Min baweriya bi Xwedê anî û bide ser reya rastiyê .
- 643) Yê ko dilpak e , xwediyê gotina xwe ye .
- 644) Heçî dara ko xelk li bin siha wê radikevin û vedizelin dibirin , Xwedê wan bi ser rûyê wan davêje dojehê .
- 645) Qeda û heft bela li mala cuhiyan bikeve yên ko tirba pêxemberên xwe kirine mizgefta xwe .
- 646) Ji nîmeta ko bi xweydana eniya xwe û keda peyê xwe na keve destê we bigerin , devberdana wê ji mineta xelkê çêtir e .
- 647) Qencî xwediyê xwe ji tengasiyê derdixe .
- 648) Li ba min qodrê zanînê ji xeyra ibadetê çêtir e .
- 649) Paşgotiniya heval û cîranên xwe me kin , ew tiştêkî xerab û pir guneh e .
- 650) Jinikeke xerab soyekî bê av dît , av kişand û ber wî da , Xwedê di gunehên wê pîrekê hemî borî .
- 651) Pez xeyr û bereket e . Xwediyê dovê xelayê na bîne . He- ta roja piştawiyê eniyê hespan bi xeyr û oxir e . Xulam û xadimê we hevalê we ne , hergavê dilê wan bi danekê şa bikin , û gava ew dikevin tengiyê , wan di wê tengasiyê de me hêlin .
- 652) Ez , ji tercalî bêtir , ji wan dindar û misilmanan di- tirsim yên ko gotinek bi rastî ji xelkê re na bêjin , ji bona kar û menfeeta xwe xelkê xesim û nezan dihêlin û wan didin ser reya xwar .
- 653) Mirovê ko tiştên li ser reya ko xelk jê aciziya dikin , ji rê hiltîne digihe kerema Xwedê û Xwedê di gunehên wî dibore .

- 654) Zanîn û hînbûn ji ibadetê hêjatir e , bi ibatdetê mirov nefsa xwe xelas dike , bi zanîne dîn , millet û welat xelas dibin .
- 655) Zanayên we yên ko bi kêrî dinyayê na yin li axiretê ji xeyra wan tu ne .
- 656) Rastî , qencî û rûspîkirin e , bi rastiyê mirov digehe miradê xwe , derew rûreşî ye , rûyê xwediyê xwe reş dike û mala wî xirab dike .
Di îşê diyanetê de zêde me rîn , zêde me rîn , dîn û diyaneta we jê zererê dibîne .
- 657) Tim bala xwe bidin rim û şûr û xenceran û ji destê xwe ber ra me din , mijûlahiya spehîr , mijûlahiya silehê ye .
- 658) Qenc û mihriwan , comerd û dilrehm bin , xatirê xelkê me şkênînin , qedrê wan bigirin .
- 659) Çavê we bila ne li malê xelkê be , dilê xwe me bijînin bi mal û dewlemendiya xelkê , timakariyê me kin , dawiya wê poşmanî û belengazî ye .
- 660) Tiştê hêja ko hon dizanin ji xelkê re jî bidin zanîn , îşê xelkê sivik bikin , mezin me kin .
- 661) Jina teşîrê ya ko mala xwe de hiriya xwe dirêse bi qedr û qîmet e .
- 662) Zaroyên xwe hînî soberiya avê û nişana tîfingê bikin .
- 663) Çaxa dê û bavê we , pev re , banî we kirin , berî werin cem deya xwe .
- 664) Di roja tengayiyê de arîkariya mirovan bikin , maldar bi malê xwe , zana bi zanîna xwe , karker bi xwêhdana eniya xwe , pale bi qiweta lep û peyê xwe ...
Heke qencî ji we na yê , xirabiyê bi kesî me kin .
- 665) Xwedê ji wî mirovî hez dike yê ko hevalên wî dişkên û direvin , lê ew bi xwe ji cihê xwe na lebite , şer û lê - xistinê dike û li hember dijmina disekine , an dijmina dişkênîne ya rûnê xwe dide .

- 666) Derman bidin nesaxên xwe , Xwedê derd daye û derman ji daye .
- 667) Yê ko serekî dide nesax û birîndaran parek wî di bihustê de heye .
- 668) Dewlemendê ko li gora demletiya xwe nan û av dide xelkê û arîkariya kêmketîya dike , mîna mirovê ko sê mehan di - gire qedigiran e .
- 669) Cil û nivînê xwe , derw û hewşa xwe , gund û bajarên xwe paqij bikin , wek cuhiyan gemar û rêvin me bin .
- 670) Mizgîniya xweşiyê bidin wî camêrê ko bi eyb û kêmaniya xwe mijûl dibe , xelasa nefsa xwe dixwaze , tadê li nefsa xwe dike , hewce bû xwe diêşîne û ji ber vê yekê bi qisûr û kêmasiya xelkê mijûl na be .
- 671) Dev ji zanîna ko bi kêrî axiret û dinyayê na yê berdîn.
- 672) Mijûlbûna sactekê li ser zanînê ji nimêj û ibadeta şe - vekê çêtir e û mijûlbûna rojekê li ser zanînê , ji sed mehên rojiyê bi xêrtir e .
- 673) Arîkariya wî belengazî bikin heya ko heqê xwe ji yê xwe xurtir bistîne .
- 674) Ne bi tenê li mezela mêrên xerîb , heke mezela deya we be jî berî ko hon derbazî hundir bibin li derî bidin .
- 675) Li her tiştî Xwedê bi qoncî emr kiriye , gava mirovekî dikujin an heywanekî şerjêdikin , zehmetê me din wan , destê xwe li wan sist bikin , bila bi rahatî can bidin .
- 676) Çaxa hon derbaz dibin civatekê silavê li wan bikin û gava derdikevin , didin ser reya xwe , xatir ji wan bixwazin.
- 677) Gava hon tene hundirê civatekê û gava hon bi şûn da vedigerin , silavan bikin û xatir bixwazin .
- 678) Ez ê tiştê ko ji nimêj , rojî û sodeqê bi xêrtir e rê we bidim ? Lihevanîna du mirovan/^{ji}wan çêtir e ; tevlokî asasê dîn û mîlet xera dike .
- 679) Mirovê ko gava qencyê dike bi qenciya xwe dilxweş dibe û gava xirabiyê dike dilteng dibe , bi xirabiya xwe dilxweş na be mirovekî pak û bawermend .

- 680) Heke tu hînî zanînekê bûyî , divê ji xelkê re bidî zanîn.
- 681) Tiştê ko ji te re hate gotin , herwekî hatiye gotin ji xelkê re jî wiha qal bike , kê û zêde me ke .
- 682) Zanîn wînda na be , lê carina zana kê dibin , ew nezanên ko li cihê zanan rûdinin , îşê xwe û yê hevalê xwe tev da şaş dikin , tişteki ji hev na gerînin .
- 683) Malê we pir be hindik be pê arîkariya belengazan bi - kin , yê ko bi tenê ji zêdahiya malê xwe arîkariya xelkê dike , mîna ew peya ye ko piştî ko zikê wî xweş têr dibe xwe - rînnayîya xwe dide birçiya .
- 684) Mirovek hat ba cenabê Pêxember û got ê : Şiretekê li min bike , lê bila kin be ne drêj be ; cenabê Pêxember gote wî : Me xoyide , xulqê xwe teng me ke !
- 685) Paşgotinî ji dan û standina faizê xirabtir e .
- 686) Dayende , ango yê ko dide Xwedê ye , ez bi tenê par dikim.
- 687) Ji pêş min ve tu caran paşgotiniya xelkê me kin û ji min re me bêjin filan di heqê te de an di heqê filan kesî de tişteki xerab gotiye : Ez dixwazim , wadê hon tên cem min , bi çavê rehmê li we binêrim .
- 688) Nîşanê minafiqa çar in : Gava dipeyivin derewan dikin , ko wad dan li wada xwe diqulîpin , ne xwediyê gotina xwe ne , gava ji wan re emanetek tê dayîn xafîniyê pê re dikin û di doz û dawa xwe de tadayî û neheqiyê dikin .
- 689) Di sînga we de perçeyek goşt heye , heke ew pak û safî ye , her tiştê we qenc e , heke ew xirab e , her tiştê we neçak e ; ew perça goşt dil e .
- 690) Gava dikin , tembî û şîretan li xelkê bikin , wexta wê xweş bizanin , wextin henc xelk ji şîretan aciz dibin û wextin hene şîret û gotina we diçe heta dilê wan .

- 691) Windabûna zanîn û zanayan pîr bûna nezanî û nezanan ,
zehfêbûna serxweş û zinakeran ji elametên qiymetê ne .
- 692) Yê ko pêşnimêj e bila xelkê ji nimêj û ibadeta xwe aciz me ke ,
ne pîr bike , ne hindik bike , bi can û bîen bike ; bila
bîne bîra xwe ko , di cemaetê de , nexweşin hene , jarin
hene û mirovin hene ko îşê wan bilez e .
- 693) Hedîsa qudsî , ango Xwedê li ser zmanê Pêxemberê xwe go-
tiye : Kelima şehadetê keleha min e ; yê ko wê bêje , wê
têkeve keleha min û yê ko dikeve keleha min ji ezabê min
xelas dibe .
- 694) Her rastiye bibêjin : Yên ko ew dibihîsin pê kêxweş di-
bin an ne , ew ne îşê we ye ; xema vî tiştî me xwin .
- 695) Ji welatê xwe hez bikin ; hejkirina welêt ji îmanê tê .
- 696) Dilê sêwî û zaroyan dilê bêkes û bêçareyan xweş bikin .
Heke we ev tişt kir bizanin ko Xwedê we dê bigihîne xwe-
şiyê .
- 697) Her bixebitin , ji bona we , ji xebatê çêtir û hêjatir
tu tişt nî ne ; hon pê dinya û axireta xwe ava dîkin .
- 698) Berî îş û xebata xwe pêkbinin û piştî dest bi diayê bi-
kin .
- 699) Bê destûra Xwedê kes nî kare arîkariya kesekî bike .
- 700) Mirov ne bi diaya xelkê , lê bi emelê xwe , digihe rehm
û qenciya Xwedê .
- 701) Mirovê ko bi kêrî dinyayê na ye , bi kêrî axiretê na ye .
- 702) Nanê xwe ne ji xebata xelkê , lê ji keda xwe bixwin .